welat

Sal:3 Hejmar:111 3–9 Avrêl 1994 10.000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

## Di 5'ê mehê de Welat dîsa li DGM'ê ye

**Rojnameya me 5'ê Avrêlê, roja sêşemê saet li 10.50'yê şeveqê ji aliyê DGM'ya Stenbolê ve tê darizandin. Emê Welat bi zimanê Kurdî biparêzin. Di vê roja girîng de em hemû xwendevanên xwe vedixwînin danişîna doza Welat.**

Rûpel 3

Di hilbijartinên cîgehî (mehelî) de, gelê Kurd bi piranî neçû ser sindoqan û bi yek dengekî got:

# Êdî em we naxwazin!

*Di 27'ê Adarê de hilbijartinên belediyeyan li Tirkiyeyê û Kurdistanê bi beşdarbûneke pir hindik û boykoteke mezin ve rû bi rû ma. Li Amedê gel li gorî daxuyaniyên fermî % 50 zêdetir hilbijartin boykot kirin, li Dêrsimê ev rêje % 80 ye. Li aliyê din, misewa serî li lijneyên hilbijartinê tê dayîn ji bo îptalkirina hilbijartinê. Ji ber ku hîle, sextekarî, guman, ji nû ve rayavêtin, û nejimartina rayên partiyên din û hwd.*

*Serokê Giştî yê Partiya Karkerên Kurdistan Abdullah Öcalan li ser encama hilbijartinan daxuyaniyek da Özgür Gündemê û gote ku di hilbijartinên cîgehî de partiya şerê taybetî kar kiriye. Öcalan diyar kir ku, "Wê encama hilbijartinê bi xwe re bêaramiyê bîne." Li ser hilbijêrên Kurd jî daxuyand ku ji nîvî bêhtir rîayetî boykota PKK'ê kirine.*

Rûpel 8





## *Li San Diegoyê Civata Kurdî*

Rûpel 16



## *Kesî qêrîna zarokên Kurdan nedibihîst*

Rûpel 12

# Gelê Kurd li hêviya avakirina eniya neteweyî ye!

Di van rojên dawiyê de Komara Tirk, ji gelek aliyan ve, bi giranî ji aliyê leşkerî ve, hemû îmkanên xwe bi kar tîne.

Li dijî hovîtiya mêtingerên Tirk, têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistan jî, hilgavtinên gelek girîng avêtin. Ev pêşketin û hilgavtin dostanî, hevkarî û ji bo eniya neteweyî di navbera hêzên bakurê Kurdistanê de gavên yekîtiyê bûn. Lê mixabin ew gavan diavêjin navêjin, nagihên dawiyê. Berpirsiyarên hêz ên ku karê cephe didin meşandin bû salek hîn tiştek ji gel re diyar nekirine, gel agahdar nekirine.

Ev kar salek e tê meşandin, mixabin hîn tiştek li holê tune, wekî tê xuyan gav sist bûne, ji her hêlekî dengek tê; hinek xwe berpirsiyarên gel dibînin, di dîroka têkoşîna wê de bi rêwîtî di Kurdistanê de derbas nebûne. Hinek partî û hêz li Ewrûpayê ava kirine, salê belavokek dernexistine, xwe Xudanê Kurdistanê dibînin. Hinekan jî her tim hêviya xwe bi Ewrûpa yê ve girê didin, bi vê hêviyê tenê li dozê dinêrin. Dema avakirina eniyê dixwazin, tenê dixwazin raman û daxwazên xwe bi cih bînin û di komîteya beraberî de bê hilbijartin berpirsiyarî û serokatiyê bikin. Bi van tenê jî namînin dibêjin pêwist e ERNK an bi nemaze ARGK di bin însiyatîfa me de bimeşe, jê hinek jî dibêjin pêwist e şer bê rawestandin û hêzên şer ji nû ve bên avakirin.

Bêguman bi van dubendîtiyan û teneqûzan serkeftin zor e, lê çareserkirin û avakirina eniyê ji bo gel li hemberî raya giştî ya navneteweyî gelekî girîng e, pêwist e berpirsiyarê hêz û partiyan fêda gel bidin ber çav, ne ya partî û hêza xwe. Gelê Kurd li hêviyê eniyê ye, li hêviya mizgîniya wê ye. Her hêz û partî li gor quweta (hêz) xwe divê kar bike û berpirsiyariyê hilgire. Sîstemên pirrengî û pirpartî jî pêwist û demokratîktir dibînim.

**Ahmet BARAÇKILIÇ**

# Rastnivîsa zimanê Kurdî yekîtiyeke xurt divê

Ji bo serûberkirina zimanê Kurdî em hêviyê ji zimanzan, civaknas û ronakbîrên me, yên ku têkildarê nivîsandina bi Kurdî ne, dikin. Divê zimanê Kurdî bi pêşengiya Amojgeha Zimanê Kurdî bibe xwediyê rastnivîs û rêzimanekî bi pergal û nûjen, bi vî awayî jî dîsa bi destê wê saziyê ji bo pêşerojê bê parastin. Niha êdî em nizanin kê rexne bikin, li dû kê biçin, em nizanin kî jî rast nivîse. Wek hûn dizanin jixwe xwendevanên bi zimanê Kurdî pir kêm in, ên hînî xwendinê bûne jî bi alikariya kovar û rojnameyên Kurdî hîn bûne.

Mînak, ez vê nameyê bi saya Rojnameya Welat dinivîsim. Rêziman û nivîsandina Kovara Rewşen, Nûbihar û Rojnameya Welat % 90 wek hev in. Lê ya çend pirtûk û Rojnameya Azadî cuda ye.

Di Kovara Rewşenê hejmara 12, rûpel 37'an de nivîsareke Birêz F. Husên Sağnîç, li ser ziman û rastnivîsê derket, di vê nivîsê de jî hinek cudatiyan bala min kişandin, bi vê jî ez ketim rewşa bêhêvîtiyê. Çend peyvên ku li wir bala min kişandin ev bûn, " şxwe, zman, krin, nha, çqas, xrab, hnek..." Ev peyv di Rojnameya Welat de wiha derbas dibin; "jixwe, ziman, kirin, niha, çiqas, xirab û hinek." Ji bilî van Seyda Sağnîç di nivîsara xwe de "ı"û "i" ya Tirkî bi kar aniye.

Em hêvidar in ku Mamosta Sağnîç ji bo me, kesên ku hîn nû hînî xwendina bi Kurdî dibin, vê rewşê şirove bike û ev pirsirêk bi awayekî rast û dirust çareser bibe.

**Rêber RONÎ**

# *Bi Kurdî bixwînin*

Li ser daxwaza **Kurdologê Amerîkayî Selmanî** em vê helbesta Cigerxwîn diweşînin. Selmanî pêşniyara weşandina vê helbesta li ser xwendina zimanê zikmakî wiha ji me re tîne zimên: **"Gelî hevalino ji bo handana (teşwîkkirina) xwendinê li nav gelê me, dibe ku ev helbesta Cigerxwîn bi kêr bê!"**

**XWENDIN**

Xwendin nebî kes naçe pêş,
Peyda dibin pir derd û êş,
Her dem di bin destê neyar,
Em dê bidin xûkî û bêş.

Ev tac û şewket xwendin e.
Ev dîn û dewlet xwendin e.
Ev serbilindî xwendin e.
Ev dewlemendî xwendin e.

Her çi nexwendî rencber e,
Ê ku bixwînî rêber e,
Her dem di nêv xan û sera,
Serkar e ew ya serwer e,

Ev tac û şewket xwendin e.
Ev dîn û dewlet xwendin e.
Ev serbilindî xwendin e.
Ev dewlemendî xwendin e.

Xwendin divê hem pir xebat,
Bo milletê Kurd û welat
Kurdino ji xew rabin hemî,
Mizgîn li we roja me hat.

Ev tac û şewket xwendin e.
Ev dîn û dewlet xwendin e.
Ev serbilindî xwendin e.
Ev dewlemendî xwendin e.

**CÎGERXWÎN**

# Nivîsara Welat

## Kî çiqas Celadet Bedirxan dinase?

Em hefteya din li ser girîngî û pisporiya mamosteyê mezin Celadet Bedirxan sekinîn û me pêwistiya bikaranîna rastnivîsa wî anî zimên. Niha jî emê li ser weşan û kesên ku Celadet dişopînin bisekinin û binirxînin, ka ew çiqas wî dişopînin.

Welat û gelek weşanên din ên Kurdî îdîa dikin ku rêzik û qeydeyên C. Bedirxan pejirandine û li gor wan dinivîsin. Li aliyê din di pratîkê de ev îdîa bi temamî nayên pêkanîn. Tevî vê îdîayê, gelek cihêrengî di navbera zimanê wî û yê kesên ku wî dişopînin de hene. Ji xeynî çend kovar û rojnameyên Kurdî yên wek Azadî, Govend, Deng, Roja Nû û çend kesên wek F. Huseyn Sagniç, Torî û hwd. îro zehfê weşanên Kurdî bo mînak Welat, Nûdem, Nûbihar, Medya Güneşi, Newroz, Rewşen, Enstîtuyên Kurdî, Armanc, Wan, Sîrwe, Stêrka Rizgarî, Hevdem, Çanda Gel û hwd. di wê îdîayê de ne ku li gor rastnivîs û rêzimana Mîr Celadet dinivîsin.

***Wek Rojnameya Welat, em giringiyeke mezin didin rastnivîsandinê û bi baldarî li ser vê meseleyê radiwestin. Dibe ku di nav weşanên Kurdî de Welat yek ji yên ku herî zehf zimanê Celadet dişopîne be. Lê dîsa jî em dibînin ku kêmasiyên me bi temamî ji holê ranebûne. Ji ber vê yekê di demên dawî de em careke din li ser zimanê Welat hûr dikolin, peyvên xwe yên cihêreng tesbît dikin û bi rastnivîsa Celadet re muqeyese dikin.***

Bes dema em bi baldarî van weşanan dixwînin, dibînin ku ev weşan hinek jî li gor qeydeyên keyfî dinivîsin. Her çendî, bi giştî zimanê Celadet bi kar tînin, gelek peyvan jî li gor dilê xwe cihêreng dinivîsin. Weke ku em her tim tînin zimên, em dixwazin li vir jî bibêjin ku Celadet di çavê me de ne xwedanê zimên e, lê tenê pisporekî hêjayî nirxandin û şopandinê ye.

Ji ber vê yekê dema kêmasî û çewtiyên wî bên dîtin, pêwist e bên rastikirin. Bes mixabin di weşanên me de peyvên ji yên wî cihêreng, bi giştî bêzanebûn an jî bi tewreke keyfî tên bikaranîn, li ser sebebê vê cihêrengiyê zêde nayê sekinîn.

Wek Rojnameya Welat, em girîngiyeke mezin didin rastnivîsandinê û bi baldarî li ser vê meseleyê radiwestin. Dibe ku di nav weşanên Kurdî de Welat yek ji yên ku herî zehf zimanê Celadet dişopîne be. Lê dîsa jî em dibînin ku kêmasiyên me bi temamî ji holê ranebûne. Ji ber vê yekê di demên dawî de em careke din li ser zimanê Welat hûr dikolin, peyvên xwe yên cihêreng tesbît dikin û bi rastnivîsa Celadet re muqeyese dikin. Bi vî awayî em dixwazin hem van cihêrengiyên ku rê li ber yekîtiya zimanê Kurdî digirin ji holê rabikin, hem jî mamosteyê mezin zehftir bixwînin û çêtir nas bikin.

Hêviya me ew e ku hemû weşanên Kurdî yên ku zimanê Celadet dişopînin, ji nû ve bi baldarî li ser xebatên wî bisekinin, bixwînin, kêmasî û cihêrengiyên xwe ji holê rabikin. Ger hin tiştan cihêreng binivîsin û di rastiya wan de xwedî îdîa bin, pêwist e wê rastiyê bi awayekî zanistî bidin xuyakirin, bi sebebên mentiqî ve karibin girêbidin. Ger ne wisa be, wê herkes li gor kêfa xwe binivîse û yekîtiya zimanê Kurdî jî wê bibe xeyalek.

**BEDELÊ ABONETIYÊ**

Di bedelê abonetiyê de em hin guhertinan çêdikin. Bedelê abonetiya hundir pir hindik bû, salê (480.000). Me ew derxist 700.000 TL yî (mesrefên postê jî sebebekê zêdekirinê bû). Bedelê abonetiya derve jî bi xeletî pir zêde (salê 200 DM) hatibû nivîsandin. Me ew jî daxist 120 DM'yî.

**Mazhar Günbat**

# Di 5'ê mehê de em li DGM'ê ne

**Navenda Nûçeyan–** Rojnameya Welat di 5'ê Avrêlê (Nîsan) de li DED–S'ê (Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê) îfadeyê dide. Rojnameya me ji ber du nivîsan tê darizandin û doza radana ji sê rojan heta bi mehekê lê tê kirin. Ji bo Berpirsiyarê Nivîsaran ê Rojnameya Welat Mazhar Günbat jî, ji 2 salan ta bi 5 salan cezayê hepsê û 100 milyon jî yê pereyî tê xwestin.

Ji ber du nivîsarên hejmara 73'yan "Gelê Tirk jî bi ser xwe ve tê" (nivîsara manşetê) û nûçeyeke rûpel 5'an, "Li Edenê polîsan teror pêk anî" doz li me hatibû vekirin. Di danişîna yekemîn (31.1.1994) de, Mazhar Günbat bi Kurdî parêziya xwe kiribû, ji ber tunebûna wergêr rê li ber darizînê hatibû girtin. Li ser vê yekê Lijneya Dadgehê biryara taloqkirina dozê ji bo 5'ê Avrêlê dabû.

Welat bi hinceta ku bi riya çapemeniyê propagandaya veqetînxwaziyê kiriye û li dijî "yekitiya axa welêt û milet" derketiye tê sûcdarkirin. Li gorî Qanûnê Antî–Terorê 3713, xala 8/1–2'yan berpirsiyarê me yê nivîsaran, rojnameya me jî li gorî 2/1'a ku li Qanûnê Çapemeniyê ya bi ser hejmara 5680'yan ve hatiye zêdekirin, tê darizandin.

Doza me, ji aliyê zimên ve dozeke nû û sereke ye. Ji ber ku ta niha li Tirkiyeyê tu nivîsên bi Kurdî ji ber naveroka xwe nebûne mijara darizînê. Lewma doza ji bo girtina Welat, bûyereke cihêreng û balkêş e. Ji aliyê din ve helwest û bertekiya (reaksiyon) dozger û DED'ê jî tê etirkirin, ku biryara wan jî wê raste rast der heqê zimanê Kurdî de ya dewleta Tirk bide nîşan.



*Ji aliyê çepê ve: Anna Fernandez, Alain Maillard, Mazhar Günbat, Jean Chichizola, Ersan Arsever.*

### HEYETA NAVNETEWEYÎ WELAT ZIYARET KIR

Heyeteke ji çar rojnamevanan pêkhatî, ku Endamê Rojnamevanên Bêsînor in, di 29'ê Adarê de Welat ziyaret kir û li ser rewşa Welat agahî standin. Ji Rêxistina Rojnamevanên Sînornenas, Jean Chidizola, ji Televizyona Suisse Romande yê Ersan Arsever, ji Rojnameyên El Paris û L'Hebdo Anna Fernandez û Allain Maillard, bi mebesta lêgerîn û lêkolînên li ser rewşa rojnamevanan hefteya çûyî hatin Tirkiyeyê û ji bo agahiyên pêwist bi rojname û rojnamevanan re têkilî danîn, dîtinên wan pirsîn, pirsgirêkên wan guhdarî kirin û ji bo çareserkirina pirsgirêkên wan piştgiriya xwe anîn zimên.

Endamên Rojnamevanên Sînornenas ji Berpirsiyarê me yê Nivîsaran Mazhar Günbat agahî li ser rewşa Welat û doza girtina wê standin. Ji Navenda Rêxistina Rojnamevanên Sînornenas Yean Chichizola piştgiriya xwe ji Welat re anî zimên û gote ku rêxistina wan bi baldarî doza Welat taqîp dike. Her çar kesên ji heyetê de mebesta hatina xwe wiha îfade kir: "Mebest hatina me ew e ku em pirsgirêkên rojnamevanan hîn bibin, rê li ber pêkutî û pesta li ser wan bigirin û ji wan re bibin alîkar.

Ji bo ku Welat karibe neyê girtin û weşana xwe bidomîne, çi ji destê me bê emê bikin."

*Serokê Weqfa Azadiyan a Fransayê Daniella Mitterrand*

# Kurdistan şiband Vîetnamê

**Navenda Nûçeyan–** Serokê Weqfa Azadiyan a Fransayê û pîreka Serokkomarê Fransayê Daniella Mitterrand, ji bo meseleya Kurdî bi riya xweşikahî û aştiyê hel bibe, dest bi çalakiyeke din kir. Mitterrand ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurdî dest bi kampanyayekê kir.

Daniella Mitterrand roja 29'ê Adarê li navenda Yekîtiya Neteweyan a li New Yorkê tevî Serokê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê Kendal Nezan û Xwediyê Xelata Aştiyê Betty Williams daxuyaniyek ji çapemeniyê re kirin û kampanyaya xwe ragihand raya giştî ya dinyayê. Her wiha eynî kes, gazînameyekê ku îmzeya 10 xwediyên xelata aştiyê tê de heye û çareserkirina gelşa Kurdî bi riyên demokratîk û xweşikahiyê tê xwestin dan Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Neteweyan Butros Galî.

Stî Mitterrand daxuynd ku her diçe rewşa li Tirkiyeyê nepaktir dibe û bakurê Kurdistanê jî şibande Vîetnamê. Mitterrand li ser mesaya pêşewayê PKK'ê Abdullah Öcalan, ku ji Konferansa Bakurê Kurdistanê ya Navneteweyî re şandibû jî wiha got: "Di nav sînorên heyî de aştî tê xwestin. Wezîfe dikeve ser milê me jî ku, em ji bo kerbûna çekan, pêkanînên şerrawestinê û destpêkirina dan û standinê di nav nûnerên Kurd û hikûmeta Tirk de bixebitin. Hewce ye mebûsên Kurd ku niha girtîne bêne berdan, ji ber ku dikarin hîn bêhtir roleke baş di vî warî de bileyizin."



*Danielle Mitterrand*

Xwediyên xelata aştiyê jî daxuyaniyek ji çapemeniyê re kirin û van jî daxwaziya çareserkirina gelşa Kurdî ya bi riya xweşikahî û dîalogê anîn zimên. Di beyana xwe de wiha gotin: "Raya giştî ya navneteweyî bi taybetî jî welatên demokratîk ên Rojavahî pêwist e ku hemû derfetên xwe bi kar bînin û pê bikine ser rayedarên Enqerê, ji bo ku pêvajoyeke wiha li dar bixin."

Di nav kesên ku îmze avêtine binê vê pêşniyarnameyê, navê van kesên xwediyê xelata aştiyê jî derbas dibe: "Mauread Corrigan, Rigoberta Menoha, Betty Williams, Aziz le Dalaî–Lama, Monsenyor Desmond Tutu, Oscar Arias Sanches, Linus Pauling Adolfo Peres Esguivel, Elie Wiesel.

# HAWAR

**Dilbixwîn**

## Li ser gora Ronahî û Bêrîvanê

Me nas bikin. We hîna em nas nekirine. Bîr û baweriya me, girêdana me, meş û armanca me gelekî teküz û tunde ye. Ne tirs, ne jî kuştin tu caran nikarin gava me ya li pêş bidin paş.

Em xwe dikujin, canê xwe dişewitînin û rê nadin tu kesî ku bi rûmeta me bileyize.

Em; heke hîna we em nas nekirine, çavên xwe vekin û me nas bikin, riya me riya berxwedanê ye. Di ferhenga meşa (rêveçûna) me de "rev" nîn e. Em narevin. Bi berxwedanê em bûne însan, emê bi wê berxwedanê jî însan bimînin.

Hûn dixwazin me bitirsînin.. Hûn dixwazin me di nava dîwarên xwe de bifetisînin û hinekî hev razî bikin... Deynin li pêşiya me barîkatan! Qedexe bikin, cejn, ziman, nav û partiya me! Lê hema ji bîr nekin, emê nildin wan alên xwe, emê li ber xwe bidin. Li dawiyê divê hûn vê bizanibin, em serê xwe ji zagonên we re naçemînin. Ne li gora we, emê li gora xwe bimeşin.

***Werin, bi xwe re hemû tîm û kûçikên xwe werînin. Peyayên xwe biaxivînin, hûn dikarin çi bikin?! Belkî hûn hinekî destê me girêdin, belkî hûn hinekî me biêşînin û Çillerê bikenînin, encam çi ye? Hûn li hemberê hîmdarên Mezopotamyayê helwesteke sûcdar distînin. Doh; Mazlum, Zekiye û Rehşan, îro jî Ronahî , Bêrîvan û Muslum. Duh; Diyarbekir, îro jî bajarekî Almanyayê Manheim. Em xwe li her derê diparêzin. Em Newroza xwe, bibînin ne tenê bi mûman, bi canê xwe pîroz dikin.***

Em; mixabin hîna we em nas nekirine. Careke tenê ji xwe bipirsin; ev ciwanên taze ji bo çi canê xwe dişewitînin? Bawer bikin, ji we bêhtir em ji jiyanê, ji însanan hez dikin, lê hema hûn bi qasî kûçikên xwe jî rûmetê nadin me! Em wê helwesta we protesto dikin û xwe dişewitînin.

De bêhn bikin bêhna şewata goştê li ser hestiyên me! Bila pozê we bişewite!

Werin, bi xwe re hemû tîm û kûçikên xwe werînin.. Peyayên xwe biaxivînin, hûn dikarin çi bikin?! Belkî hûn hinekî destê me girêdin, belkî hûn hinekî me biêşînin û Çillerê bikenînin, encam çi ye? Hûn li hemberî hîmdarên Mezopotamyayê helwesteke sûcdar distînin.

Doh; Mazlum, Zekiye û Rehşan, îro jî Ronahî , Bêrîvan û Muslum.

Doh; Diyarbekir, îro jî bajarekî Almanyayê Manheim. Em xwe li her derê diparêzin. Em Newroza xwe, bibînin ne tenê bi mûman, bi canê xwe pîroz dikin.

Ronahî û Bêrîvan; du keçên cahil in, du bûkên ciwan in, Muslum Kurdekî çil salî ye, dilê wî ji bo azadiyê peritî. Xwe disojînin, lê hema hûn eger in. Em we berpirsiyar dibînin. Hûn, ên ku însanan di bin potînên xwe de dihenciqînin. We her du heval şewitandin. Bizanibin, hûnê rojekê werin ser hişê xwe, hûnê têbigihêjin ku we piştî Yahûdiyan Kurd jî dane ber hovîtiya xwe.

Rojekê hûnê poşman bibin. Hûnê bibînin ku Kurd ne leyîqî kuştin û qedexekirinê ne. Kuştina Kurdekî, kuştina însanekî ye. Lê ji bo we însan dikare bi markekî jî were firotin. Em ne wisa ne, ji bo me însan her tişt e, nayê kir în, nayê firotin. Weke we em nikarin li însanan mafê jiyanê qedexe bikin. Lewre em însan in.

Hûn mirov neçar dikin ku we însan nebîne. Kesê ku, însanan bikuje, girêde, biçewisîne, wê çawa bikaribe bibe însan?!

Dîsa pîrozbahiyek ji Ronahî, Berîvana û Muslum ciwan re, we riya şerefê ji gelê Kurd re vekir. Hûn bûne taca azadî û rûmeta gelê Kurd. Hûn paqij çûn, we tu leke li-pey xwe nehiştin. Di dilê we de gelek hêviyên din hebûn. We dixwest Kurdistana azad bibînin, ev e gel dibîne, weke we dîtibe. Riya we ronahî ye...


Silvio Berlusconi

## Li Îtalyayê telekrasî ava bû

**Nûçeyên Derve-** Li Îtalyayê di hilbijartina ku di navbera rojê 27–28'ê Adarê çêbû de, dewlemendê Îtalî xwediyê sê kanalên TV'yê, çend rojnameyan û şirketên film Sîlvo Berlusconi bi serket. Partiyên berê, yên wek, Xiristiyan demokrat û Sosyalîst ji ber skandalan û têkiliyên bi mafia re qels ketibûn. Di vê hilbijartinê de pêşbazî di navbera Hevkariya Çepgîr û Tevgera Azadiyê (kevineperest) de çêbû. Serokatiya hevkariya çepgir partiya Komunîst ya berê ku niha navê Partiya Çepa Demokratîk li xwe kiriye, dike. Serokatiya Hevkariya Azadiyê ku ji sê grûban pêk hatiye (Foza Îtalîa Yekîtiya Bakur û partiya fasîşt Yekîtiya Neteweyî) Serokê Forza Îtalyayê Karsazê Mediayê Sîlvîo Berlusconî dike. Berlusconî ji paytextê berendam bû û ji wir jî sedî 47 ray standin. Di parlementoya Jêrîn de Hevkariya Azadiyê 366 endamtî bi dest xistin, ev meclis ji bo 650 endamî pêk tê. Çepgiran jî li wir 213 endamtî wergirtin. Di sanoteyê de Tevgera Azadiyê 155 endmetî, çepgiran 122 endamtî bi dest xistin. Serketina Berlusconî bal kişand ser bandora Mediayê ya li ser bijarteka (tercih) gel.

# Hilbijartinê birînên Ukraynayê derman nekirin

■ *Piştî hilweşîna sîstema Sovyetê wek hemû komarên Sovyeta berê, Ukraynayê jî xwest têkeve riya kapîtalîzmê, dewlemend bibe. Lewma bi lez serxwebûna xwe îlan kir. Lê niha bi gelek problemên siyasî û aborî re rû bi rû dibe, rewşa xwe ya berê bi dilxwazî bi bîr tîne. Ji lew re komunîstên berê di hilbijartinan de di ser dikevin û Ukrayna xwe ber bi Rûsyayê dide.*


Li Ukraynayê jî wek hemû Komarên Sovyetê yên berê ji aliyê aborî ve gel di nava rewşeke nebaş de ye. Ji lew re, çi bi destê wan dikeve derdixin bazarê.

Roja 27'ê Adarê li Ukraynayê jî bo hilbijartina 450 endamên parlementoyê hilbijartinek li dar ket, li gorî agahiyên ku bi dest ketine, Komunîstan li vir kar kir û ji 48 endamtiyên ku hatine hilbijartin 14 endamtî bi dest xistin, divê pêgavê de kesên ku ji sedî 50 ray stendin, hatin hilbijartin, pêgav duyemîn wê di 10'ê Avrêlê de çêbibe. Rewşa polîtîk li vî welatî zêde ji hevketî ye, ji bo 450 endamtiya parlementoyê 6000 berendam derketine,%90 berendamên serbixwe ne. Li gelek deran, gel navê berendamên li herêma xwe nizane. Dewletê ji bo propagandayê 6 milyon Couponên Ukranî (150 dolar) û ji bo belavokan jî 2000 belavokî kaxiz daye her berendamî. Di nav hezên ku ketibîn hilbijartinê de, yên herî bi rêxistin Partiya Komunîst û rêxistina lîberal Rukh (tevger) e. Tê gotin ku gel li dijî helwesta Serokkomar Leonîd Kravchuk reaksiyon nîşan daye, ferqa di navbera rojhilata pêşketî û rojavayê lipaşmayî zêdetir dereket holê. Rojhilat piştgiriya polîtîkayên, Partiya Komunîst kir. Li gorî encamên ku derketin holê gelê Kirimê û yê Rojhilatê xwest ku têkiliyên xurt li Rûsyayê re bên danîn. Serokomar referandomeke der heqê Kirimê de qedexe kiribû û daxuyandibû ku heke parlementoyeke xurt dernekeve wê karê rêveberiyê bi parlementoyê berê bimeşîne û hilbijartinê Serokkomariyê bi derengiyê bêxe. Lê gelê Kirimê piştgiriya xwe ji bo têkiliyên xurt bi Rûsyayê re nîşan da.

Rewşa Ukraynayê ya aborî ne baş e. Baweriya gel bi polîtîkavanan nemaye, pir kes naxwazin biçin ser sindoqê. Li Ukraynayê bijûniya (verîm) hilberiyê ji sedî 50 daketiye. Rewşa gel ji ber enflasyonê û bêkariyê pir xerab e. Enflasyona mehî ji sedî 80 ye.

**Samî BERBANG**

## NASNAMEYA UKRAYNAYÊ

Ukrayna Komareke Yekîtiya Sovyetê bû ku di dawiya 1991'an de serxwebûna xwe îlan kir. Aqara vî welatî digihîje 603.703 km çargoşeyî, gelheya (nifûs) Ukraynayê 52 milyon e, gel bi piranî li bajaran dijî. Paytexta Ukraynayê Kîev e û nifûsa vî bajarî 2.6 milyon e. Ev welata ji 24 herêman (Oblasts) pêk hatiye, li wir Kirim xwediyê statuyeke taybetî ye. Zimanê ku herî zehf pê tê peyivîn Rûsî û Ukranî ye. Li Ukraynayê bawermendê van olan hene, ortodoks, katolîk, baptîst û cihû.

Rewşa aborî piştî hilweşîna sîstema Sovyetê ne baş e. Ukrayna di nav komarên Sovyeta berê de komareke pî pêşketî bû. Ji ber bijûniya (vêrîm) çandinî wek çala xwarinê ya Yekîtiya Sovyetê dihat bi nav kirin.

Hilberiyên çandinî: Silq, titûn, genim, ceh, gilgil. Ukrayna ji aliyê kanên madena gaza xwezayî û pîşesaziyê ve ji xwediyê îmkanên baş e.

Pîşesazî: Karê metalê, çêkirina makîneyan, çêkirina avahiyan, çêkirina xwarekê, zilê sunî, ekîpmanê komir derxistinê.




# Qaddafî: 'Ewrûpayî zirarê dibînin'

**Nûçeyên Derve-** Serokê Lîbyayê Muammer Qaddafî di hevpeyvîneke xwe ya bi Kovara Newsweek'ê re ya di 4'ê Avrêlê de daxuyand ku, Ewrûpa ji ambargoya ku li ser Lîbyayê tê meşandin, ji wan zêdetir zirarê dibîne. Qaddafî wiha got: "Bi hezaran şîrketên Ewrûpayî li Lîbyayê kar dikin, bi vê ambargoyê ew ji kar û nefta xwe bûn.

Qaddafî pirseke li ser mijara "alîkariya bi terorîstan jî" got ku, wî her tim alîkariya tevgerên şoreşger kiriye, lê hinekan ji wan li ser navê şoreşgeriyê dest avêtine terorê (wek ÎRA), ew jî ne sûcê wî bûye. Dîsa got ku, ew rizgariya Îrlandayê dixwaze. Qaddafî derbirî ku gelê Filistînî her roj bi qetlîamê re rû bi rû dibin, ji lew re mafê wan heye ku xwe biparêzin. Serokê Lîbyayê got ku mirov nikare, Ahmed Cîbrîl û Abu Nîdal wek terorîst binirxîne; ew şerekî pîroz dimeşînin.

Qaddafî pirsa der heqê bûyera Lockerbie'yê de wiha bersivand: "Qet dibetî tune ku em wan kesên ku tên sûcdar kirin bêyî daxwaza wan radest (teslîm) bikin. Ev tişt ji derî mafê mirovan û ji derî qanûnên me ye."

Qaddafî der heqê Bill Clinton de jî daxuyand ku, wî weke mirovekî baş dinirxîne, lê ew çewt tê agahdarkirin û CIA li dijî wî mirovê aştixwaz e, ji lew re dibe ku ew leqayî dawiya Kennedy bê. Qaddafî dîsa got ku, ji bo parastina Clinton û malbata wî, ew dixwaze erebeyeke bi zirh jê re bişîne. Qaddafî der barê raya giştî ya Ewrûpayê de wiha got: "Ew min baş nas nakin, wek nivîskarekî, helbestvanekî, mamosteyekî felsefê û civaknasiyê."

Di hevpeyvîna xwe de Qaddafî got, tu sedem nîn in gel li hemberî wî serî hilde, ji ber ku wî hemû tişt bi destê gel ve berdaye.

## *Roja Şanoyê ya Dinyayê hat pîrozkirin*

**Navenda Nûçeyan–** 27'ê Adarê (Roja Şanoyê ya Dinyayê), di şeva 28'ê Adarê de li Evrensel Kültür Merkeziyê (Navenda Çanda Gerdûnî) ji aliyê AÇT'ê (Dorhêla Şanoyên Amator) ve bi beşdarbûna 200 kesî dildarê şanogeriyê, hat pîrozkirin.

Pîrozbahiyê bi axaftina Şanoger Mehmet Esadoğlu dest pê kir. Esadoğlu daxuyand ku roja şanoyê her sal bi meşeke xweşik, di gel dirûşma "bijî şano", di wextê de dihat pîrozkirin. Esâdoğlu got ku îsal 27'ê Adarê bû mijara listikeke mezin (hilbijartin), ji lew re îsal ev roj bi çalakiyeke wiha biçûk tê pîrozkirin. Esadoğlu piştî vê gotinê Danezana helbestvan Sunay Akin ya derheqê şanoyê de xwend. Wî derbirî ku îsal wê AÇT di 2'ê Avrêl'ê de çalakiyeke bi navê,"Rojên Şanoyê li Stenbolê" pêk bîne û di van rojan de wê li çarmedorê Stenbolê bi beşdariya 20 komên şanoyê, lîstik bên pêşkêşkirin.

Pişt re Şanoger Gülsen Tuncer derket ser dikê û di gel axaftineke kurt sê helbest ji Brecht xwendin, li dû wê nivîskar û rexnegir Tahir Özçelik hat, Özçelik wek pîremêrekî piştgirê şanoya amator, bi giramgiriyeke taybet hat pêşkêşkirin. ATÇ'ê ew bi qewdeke kulîlk û plakete biçûk xelat kir.

Pîrozbahî bi kurte–lîstikên şanogeran qediya. Di nav van kurte–lîstikan de ya herî balkêş ya li ser 37 rewşenbîrên li Sêwazê hatin şewitandin bû. Ji bo me tiştê sosret ev ku Agirê Newrozê qet neketibû bîra wan camêran, vê jî rengê enternasyonalîstiya wan dida der.

## *Berxwedanên bi kêf û şahî*

# 'Berê, me rojiya Xwedê digirt niha jî...'



*Kêf û coşiya kesên ku dikevin grevê, ji rûyê wan tê xuyan. Lewre êdî dizanin ji bo çi û kê "rojî" digirin.*

*Kurd ji leyîstinê, govendê, strandinê gelek hez dikin. Ev rewşa Kurdan bala rojhilatnasan jî kişandiye. Ha reşik ha Kurd. Ji aliyê muzîk û reqsê ve hema bibêjin birayên hev in.*

DEP'van ji roja 25'ê Adarê ve di greva birçîbûnê de ne. Ji ber hildana muafiyeta parlementerên partiya xwe û tehde û pêkutiyên ku ji aliyê dewletê ve li wan tê kirin. Ne bi tenê li Stenbolê (li navçeyên Umraniye û Bahçelievlerê) li gelek deverên din jî wek Enqere, Izmîr û Meletê bi awayekî girseyî gel beşdarî livbazê dibe.

Li Stenbolê Partiya Demokrasiyê li du cihan grev li dar xistine. Li aliyê Enedolê li navçeya Umraniyeyê û li hêla Ewrûpayê jî li Bahçelievlerê. Herdu dever jî, bi serdan (ziyaretvan) û beşdaran ve bi dev re dibe. Bi taybetî roja 27'ê Adarê, ku ray ji bo hilbijartinên cîgehê (mihelî) dihate avêtin. Gel nêçûbûn ser sandoqan û helwesta xwe bi wî awayî dabû nîşan.

Livbaziya xwebirçîhiştinê, bi dorvegerî û bêdawî didome. Li Bahçelievlerê kesên ku di grevê de ne, hejmara wan di nav 50– 60'an de diguhere. Rêveberên DEP'ê bi taybetî sînor danîne ku hejmara livbazan ji 60'î nebihure. Ji ber ku cihê wan teng e. Li navçeyê, grev di 25'ê Adarê de dest pê kir.

### DENGÊN STRANÊN DIJBER LI KUÇEYÊ BELAV DIBIN

Beşdar û serdanên grevê, starnên xwe yên dijber (muxalîf) li ser kolan û kuçeyên Stenbolê belav dikin. Bi gotineke din, bi stranên ku navên qedexekirî (!) tê de ne serî hildidin. Hîn ku mirov ber bi cihê livbazan ve diçe naçe, ew deng mirov ber bi xwe ve dikişînin. Belê stran, tilîlî û dengê def û zirneyê nahêle ku, ji yekî/ê bipirsî ka cihê grev lê heye li ku ye. Ango pêwistî bi pirsê û rêzanekî/ê re namîne. Ev rewşa ku me li jorê jê behs kir, hem li navçeya Umraniyeyê rêxistina DEP'ê û hem jî li ya Bahçelievlerê wisa ye.

### JI ALIYÊ REQS Û MUZÎKÊ VE HA KURD HA REŞIK

Heta mirov carina xwe ranagire û ji xwe dipirs e, gelo ev şahiyek e an jî livbaziyek e? Pirsên bi vî awayî zehf kes ji hev dikin û bersiv wiha tê dayîn: ***"Kurd bi rastî jî miletekî pir ecêb e. Şîna xwe kiriye şahî. Şehîdên xwe bi tilîlî û stranan ve bi rê dikin. Lê ev e ku me li ser piyan dihêle. Hêvî û ji kêf û şahiya xwe neketin."*** Kurd ji leyîstinê, govendê, strandinê gelek hez dikin. Ev rewşa Kurdan bala rojhilatnasan jî kişandiye. Ha reşik ha Kurd. Ji aliyê muzîk û reqsê ve hema bibêjin birayên hev in.

Hunermendên Navenda Çanda Mezopotamyayê qet ji grevê namînin. Ger bi dengbêjan û ger jî bi govendgêran, livbaz bi tenê nahêlin. Ji derve jî, kesên ku bi dengên xwe û hunerên xwe ewle ne, xwe didine nîşan. Ji aliyê din ve, ji serdanan bêhtir, kesên ku di greva birçîbûnê de ne, di cihê xwe de neditebitîn û her li ser lingan bûn. Govend digirtin, distrîn. Ji mirov kirî yên ku di grevê de bûn, ne ew bûn. Hinekî din bûn. Rûçikên wan bi ken û gewz bûn. Bibîkên çavên wan dikeniyan. Rewşa ku tê de bûn nedianîn ser xwe. Li ser silavkirina dengbêjekî ku greva wan î birçîbûnê pîroz dikir, pîrekek bi vê şêweyê lê fetiland. ***"Çima em birçîne? Welle em ne birçîne. Ma em ji mebûsên xwe çêtir in."***

Derdorên çapemeniya sosyalîst, rewşenbîr, rêxistinên karmend û karkeran, komeleyên demokratîk, xwendekarên unîversîteyan û yên din eleqeyeke mezin nîşanî livbaziya DEP'ê didin. Hem bi xwe serî li grevvanan didin û hem jî bi mesajên xwe ve. Di nav komeleyên demokratîk de ya "Komeleya Dijberên Cengê" dêhneke baş kişande ser xwe. Serokê wê Arif Hikmet İyidoğan pêwist dît ku bide diyarkirin ew bi xwe ne li hemberî cenga bi heq û maf e. Lewre dadixuyand ku di nav wan de ji gelek hêlan kes hene ku ji aliyê ramanî ve ji hev cihê ne.

### JI HER RENGÎ MIROV DI MILÊ HEV DE NE

Pîrekeke ku bi girêdana xwe ya sade bû, mebesta xwebirçîhiştinê bi vî rengî dadixuyand: ***"Berê me rojiya Xwedê digirt. Niha jî em rojiya Apo û ya mebûsên xwe digirin. Hereketên Apo û yên Hz. Pêxember wekî hev in."*** Di navbera zilamekî navsere û ciwanekî di jî gengeşiyên li ser olê (dîn) çêdibûn. Ciwan li ser bondora olî ya li ser civaka Kurd a nêyînî radiwestiya û ji dixwest ku çima hîn jî pê bawer dike. Zilamê navser jî diyar dikir ku, mesele wan ne li ser dîn e. Heta digot ku,ji Pêxember bi vir ve tevî Hz. Ebûbekir îslam ji rastî û heqîqetê dûr ketiye. Pê jî nedima, ji ciwan re rexne jî dianî ku bêsebr e û navê komunîstiyê jî digot ku gelek car lê hatiye kirin. Ciwan ji malbateke Elewî û yên din jî Şafî bû.

### KU STRAN NE YÊ ŞOREŞGERÎ BIN!

Kêfa beşdaran bi zêdetirî ji stranên şoreşgerî û yên ku navên şehîdan, serokatiya partiyê û navê Partiya Karkerên Kurdisatnê tevî enî, artêşê tê de dibihurîn, dihat. Kesên ku yên gelerî digotin henek û tinazên xwe bi wan dikirin. Heta di stranekê de ji ber ku ji Tansu Çiller re, "dêlika Çiller" hate gotin bertekiya livbazekî kişand. Wiha digot: "Divê mirov ji neyarê xwe re jî wiha nebêje."

Kurmanc û Dimilî ku werine cem hev, xwe ragirin jî île tiştek diqewime. Keçikeke Tetwanî digot ku hevalekî wê yê "Zaza" hebûye û tim pê henekê xwe kiriye. Çima ku doza Zaza welatekî serbixwe dikin û ji xwe re dibêjin, ***"Em ne Kurd in, Zaza ne!"*** Xortê ji Gimgimê di binê gotinê de nema û bersivê dayê: ***"Heval mîtek derketiye wisa gotiye, we jî pê bawer kiriye. Vêca ez bi we dikenim."***

**Zana FARQÎNÎ**

# Almanya û PKK çi ji hev dixwazin?

Wekî ku tê zanîn û bîranîn ev çend sal in ku dewleta Alman bela xwe ji PKK'ê venake û her tim bi awayekî êrîşkar bi ser PKK ve diçe. Ji destpêkê, ji ber hinek bûyerên ku li Almanyayê pêk hatibû, dewleta Alman bi salan in ku di dehan kesên nêzîkî PKK di zindanên Almanya de digire. Çend roj berê mehkemeya wan girtiyan bi dawî hat. Hinekan ji wan bi muebet, hinek çend sal ceza girt û hinek jî bêtawan (sûc) hatin dîtin û hatin berdan. Piştî wêrankirin û şewitandina Licê, dîsa hinek komeleyên ku nêzîkî ERNK'ê bûn, an jî hinek kesên ku nêzîkî van komeleyan bûn, xwestin li seranserê Almanyayê ji bo wêrankirin û şewitandina Licê, bi hinek çalakiyên demokratîk dewleta Tirk protesto bikin. Ji ber vê yekê, dewleta Alman dîn û har bû. Avêt ser wan komeleyên nêzîkî ERNK'ê. Hinek ji wan girtin. Dest da ser mal û eşyayên wan. Gelek berpirsiyar û endamên wan ên aktîv bi rojan girtin û avêtin hundir. Hinek ji wan hîn jî di girtîxaneyê de ne. Almanyayê meş û şevên Newrozê qedexe kirin û niha jî dike. Piştî qedexekirina şev û meşan, dîsa di navbera endam û Kurdên nêzîkî ERNK'ê û polîsên Almanî de şer û pevçûnan dest pê kir. Gelek bûyerên mezin û nexweş çêbûn. Bi saetan otobanên Almanyayê ji aliyê Kurdan ve hatin girtin. Li Almanyayê jiyan li ku ba radiwestiya. 9 Kurd benzîn li xwe kirin û xwe şewitandin. Ji wan du jin û mêrek şewitîn û mirin. Bedriye Taş, Bêrîvan û Muslum.

Mesele çi ye? Çima şer û pevçûn di navbera ERNK'ê û polîsên Almanî de derket û derdikeve? Wekî ku dewleta Tirk, radyo û TV'yên Tirkan dibêjin û dinivîsînin bi rastî ERNK'ê dixwest bêîzin Newrozê pîroz bike? An jî wekî ku hinek Kurd û derdorên wan dibêjin, "jixwe Newroz cejn e, şahî ye. Lê, ERNK û PKK dixwazin Newrozê bi kuştin, lêdan û xwînê pîroz bikin." An jî sedemekî din heye? Yanî rastî çi ye?

Polîsên Alman, der heqê Kurdan de ji polîsê Tirk jî dijwartir û hartir bûne. Komeleyên Kurdan digirin. Nahêlin meş û civînên Kurdan çêbibin. Ala Kurdan, fotografên Apo qedexe dikin. Heta navên Kurdî qedexe dikin. Kurdan bi deh salan digirin û diavêjin zîndanan. Li Almanyayê cezayên bi dardekirinê didin Kurdan. Dewleta Alman van kiryar û helwesta xwe jî, li ser navê demokrasiyê dike. Dema mirov piçek li ser van bûyer û kirinên dewleta Alman bifikire, dibîne ku di navbera dewleta Tirk û Alman de tu ferq tune. Ma dewleta Tirk jî ne van tiştan dike? Ma Kurdan çi bi Almanyayê kiriye? Ma çi kap û guzên Kurd û Almanan hene ku nikarin û naxwazin ji hevdu par bikin? Gelo Almanyayê Kurdistan dagir kiriye, an jî



Di Newroza îsal de, gel sê qurban da, rejîma Almanyayê. Ronahî, Bêrîvan û Muslum.



Polîsên Almanî bi tehde û zilma xwe hêzên dewleta Tirk bi bîra gelê Kurd anîn.

Kurdan Almanya dagir kiriye? Çi ye? An jî, wekî wan Kurdên bi eqil (!) ku dibêjin "Ma PKK, jixwe li ku be, ew dixwaze teşqele derbixe. Ew bi tenê ji lêdan, şikandin, wêrankirin û xerabkirinê fêm dikin... Dixwazin Newrozê wiha pîroz bikin..." e?

Belê, ne Kurdan Almanyayê dagir kiriye û ne jî armanceke wan a wiha heye. Ne jî Almanan Kurdistanê dagir kiriye ku PKK li dij wan der bikeve û têbikoşe. Di navbera xelkê Kurd û Alman de tu problem tune ye. Di navbera PKK û dewleta Alman de jî, tu problem tune ye. Wê gavê, ma ev çi xir û gir û teşqele ne? Niha rastiya meseleyê çi ye? Dewleta Alman di salê de, bi milyaran malzemeyên eskeriyê, wekî tanq, top, panzer, helîkopter û çekên din difiroşe Tirkiyê. Heta kûçikên perwerdekirî difiroşe Tirkiyê. Ew kûçikên ku niha komandoyên Tirkan li Kurdistanê berdidin xelkê. Yanî Almanya bi Tirkiyê re ne bi tenê ticaretiya çekan (sîleh) dike, ew ticaretiya keç û kûçikan jî dike. Ji ber vê yekê jî, hikûmeta Alman bi çar destan bi Tirkiyê girtiye. Îro li darê dinyayê ji Tirkan Tirktir dewleta Alman e. Belê, ev Tirkbûna Almanyayê ji firotina tanqê heta kûçik tê.

Almanya ji ber ku bi milyonan mark tanq, top, balefir û heta kûçik difiroşe Tirkiyeyê, naxwaze Kurd li Almanyayê mafê xwe yê demokratîk bi kar bînin. Di van demên dawî de, wiha bû ku dewlet û hikûmeta Alman ji Tirkiyê jî xerabtir bû dijminê Kurdan. Kurd, li metropolên Tirkiyê dikarin Newrozê pîroz bikin, lê nikarin li Almanyayê pîroz bikin. Dîsa dikarin Stenbol, İzmir, Enqereyê beşdarên cenazeyên şehîdên xwe bibin, lê nikarin, li Bonn, Berlin, Köln û li bajarên din ên Almanyayê beşdarê cenazeyên şehîdên xwe bibin. Ji ber vê yekê jî Kurd bêçare dimînin, li Almanyayê li ber çavên dinyayê xwe dişewitînin.

Xweşewitandina Kurdan li Almanyayê li seranserê dinyayê rûreşiya mirovahî û demokrasiyê ye. Xweşewitandin reaksiyona herî mezin û dijwar e. Bi helwesta ji navê rakirina laşê xwe, yên derî xwe protesto dike. Zerarê dide xwe. Ji derê şexsê wî/wê zerar nagihîje kesekî din. Lê, hezar mixabin dewlet û hikûmeta alman jî wekî ya Tirkan ji vê cureyê protestoyê re jî dibêje "terorîzm".

Xweşewitandin, di dinyayê de, cesaret û fedekariya herî mezin e. Ji bo welat xweşewitandin, merteba welatparêzî û şehadetbûna herî mezin û pîroz e.

**Amed TÎGRÎS**

# Adirê Nevroze de vêşayene

*(Zazakî)*

Güreşi emir da, Çillere kerd eşkera û Erkanî jî Amed de bi domanan kay kerd; Wezîrê Zerî Menteşe wunciya ebi metodanê Göbelsî propoganda kerde; Medya "mehmetçike", Konsolonsê Tirkan, Wezîr û Serokê Partiyanê Tirkan, "Nevruza" Tirkan pîroz kerde; qorîciyan siya ala Tirka, panzeran, polos û leşgeran de "Nevruze", "Nevruza" yo û yê verganê Asya Wertî pîroz kerde. La belê heto bîn de dikanî guretê bî, şar çê xo de bî. Kes nêşî teber, ke teba qorîciyan û vergan mebo. Namê Newroze, namê xo û şarê xo qilêrin mekero. Sukî tal mendî, dowî tal mendî. Dewleta koledare 70 sera ke xo vîra kerda "Nevruz"o yê vergan a. Ebi vatenede bîne hama zerê di rojan de "Nevruza" vergan doz kerde. Bêguman tewr pîlî ra hetanî tewr qijî qe yew mordemêde xo, qe yew general, wezîr, rojnamevan, profesor, doktor û êb. nêşermayî. Ma Kurdan se kerd? Kurdan wunciya newrozaxo bîroz kerede û serba nayê jî Kurdî wunciya amê guretene, amê kuyene. Na, tebera asayêna welatî biye. Ma tebera sebî? Newroza emserî ya teberî, yanê xerîbiye de, Îlem Newrozanê her sere ra û herm jî Newrozanê welatî ra xêlê cuda biye. Ze şaranê xerîba, şarêma jî nê sûrêtê Newroza 94 î tebera TV weletanê bînan de TV û rojnamanê Tirkan de, Rojnamanê Kurdan de dî û wend. Ma dolimêna kilm Newroza emserî ser ro vindîme.

Sebeta ke verde îzne amê bî guretene, ebi bîr û baweriye, ke Newroze salona unîversîta teknîkî ya Berlin de êna pîroz kerdene welatparêzê kurdan, dostê dînanê Tirkî, Almanî û xerîbê bînî, şî verê Unîversîta Teknîkî ya Berlinî. La belê mordem se restêne naca, polosî û erebê dînan amêne diyene. Bêguman nê bêsebeb niyamê bî. Sebeb; ganî Kurdî roşana xo pîroz mekerê! ze Tirkiye. Qeyî? Ma Kurdî "terorîst" ê! Kesîtiya PKK'ê de Kurdî pêro çimê dewleta Almanan de "terorîst" ê!..

Eke Kurdî bî "terorîst" û amê ke Newroza xo pîroz bikerê, yê bînî şima bi xo bifikirê sebeno, waxto ke dewlete polosan serba vilakerdena şarî birûşno, ke Newroza Kurdan bido vindarnayene. Û hênî jî bî. Yane polosan hem nêverda şarê Kurdî roşana xo pîroz kero û hem jî ser de erîşî domananê, cêniyanê, kalanê, xortanê Kurdan kerd. Gor dînan ganî Kurdî biremêne, vengê xo mekerdêne. Dewlete û polosan se va, ze dînan bikerdênê. La belê hênî nêbî, Kurdî nêremay, xoverda. Xwezila şima pêrîne bidiyêne, se qij-pîl, zav-zêç, cênî-camêrdê kurdan, xerîb-dost û hevalên Kurdan bi biratiye hevaltiye, bi yew zere û fikir wayştêne wayîrê roja xo vejiyê. Ti va qey bîr û bawariya Mazlum ya Zîndanê Amedî, bîr û bawariya Zekiye ya suka Amedî Almanya de, verê Universîta Teknîkî ya Berlin de biye eşkera, dolimêna xo dî. Welat parêzan benzîn verda xo ser û wayşt ke xo bivêşnê. Na bîr û bawariye, na heskerdena welatî û Newroze nîşanê raxelesiyena Kurdan, nîşanê xowurnayêna kesîtiya Kurdan û şerê dînan a. Rojane binan ji sukane Almanya de bi na bîr û bawariye, bi na heskerdena welatî Kurda Newroza xo pîroz kerde û emser jî tebera, Almanya de şehîdî day.

Gelo se beno? Mordem xeribiye de serba pîrozkerdena Nevroze, adir nano xora, adirê Nevroze de xo vêşneno? Waxto ke mordem bi çimanê xo mevîno, nivisnayêna naye, rayştiye jî xêlê zamet a. Hama mordem ke çimanê xo dî, ne teyna kesê welatparêzî, la belê heval û dostê bînî, ha Tirk, ha Alman; ha welatparêz, ha dost û meyman; şaro ke amêbî naca pêro, se ebi can û ruh, se ebi şewqêde girs û bi yewtiye xover dênê, teyna o waxt mordem şîkîno cevabê persa corêne bidêro.

Xêca naye Nevroza emserî de bawarî, xoverdayene, cesaret û hetkariya hevalanê bînan, yewtiya Kurdan pratîk de jî kerde eşkera. Mordem ganî gor na bîr û bawariya yewtiye heskerdena welatî, serbeta ke serba şarê ma, serba, azadî û serfiraziya dê berhemanê rinda bicêro, teberê welatî de, zafêriyê jî Almanya de, stratejiyanê newiya dozkero û înan biyaro kar.

**L. JANDÎL**

**Neqtik**

*Netewe heta ku xwediyê zimanê xwe be, heye.*


***Gotineke pêşiyên Çekoslovakiyan***

**KÊ ÇI PEKAND?**

**"Ji balefirê bêhemdî bombeyek ketiye û li gundên Şirnexê 14 kes mirine.'**

*Nûçeyeke Çapemeniya dewleta Tirk*

# Kurdistana 'AZAD'



Li Kurdistanê dem pir zû diherike. Êdî rojek ji roja din cihêtir û pirrengtir derbas dibe. Di van salên dawîn de li ser dinyê ecêbên giran diqewimin.

Xwedê zane wê Komara Tirkiyeyê, di demeke nêzîk de komarek din ava bike. Xwendevanno! Guhê xwe baş bidin vê yekê; ev ne komara henekan e. Navê wê jî (Li gorî rayedarekî ku di Wezareta Karûbarê Hundirîn de dixebite û naxwaze navê wî bête nivîsandin) Komara Kurdistana Kontrayan û Cerdevanan, yanî bi kurtahî KKKC ye. Wek hûn jî dizanin Komara Tirkiyeyê çend sal berê li Kıbrısê jî komarek bi navê KKTC (Kuzey Kıbrıs Türk Cumhuriyeti) ava kiribû. Wer xuya ye ku Tirkiye, di vê meselê de (bi tenê di vê meselê de) bûye pispor (uzman). Ê ma ev kar jî ne hindik e ha! Me Kurdan du hezar sal kir û nekir, nikaribû dewleteke wek pînekê jî ava bike. Lê ma cîranên me Tirk; ger bixwazin dikarin di nav çend mehan de dewleteke ava bikin.

Li gorî agahiyên nediyar, ji zû ve cîranên me dest bi vî karî kirine. Dîsa li gorî van agahiyan, ev komar wê heta demekê bêelektrîk bimîne, ji bo ku saziyên xwe ji nû ve amade bike û paqijiya welatê nû (Kurdistana Azad) bikin. Li me Kurdan pîroz be ku ev dijminê ha, hela ji xêra xwedê re hûn lê mêzekin (bê kê dikarîbû texmîn bikira), wê rojekê rabe û bêdaxwaziya tiştekî, dewleteke ji Kurdan re ava bike. Piştî TC û KKTC'yê, KKKC jî tê avakirin. Aqûbet li serê Lazan û miletên din be (Amîn).

Wek hûn xwendevanên me jî dizanin, di hejmara rojnameya Welat ya 110'an de manşeta "an Serketin an Serketin" pir bal kişandibû. Serokwezîra Tirkiyê Tansu Çiller (Bi tesîra vê manşetê) ji bo Kurdistana Azad "Serketin" xwestiye û bi herdu tiliyên xwe nîşan a serkeftinê kiriye. Wek me li jor jî daxûyand ku dinya di van demên dawîn de pir hatiye guherandin. Heger hûn ji vê nûçeyê (haberê) bawer nakin, ji kerema xwe re li wêneyê Stî Tansu Çillerê binihêrin, yan jî ji bo çend rojan her in Kurdistanê. Heke hûn wek Kurdekî serhişk dîsa bawer nakin; li ser vê nimroya ku emê li jêr binivîsin, bigerin, wê bersiva we bête danîn. Ji bo agahiyan nemroya vê Tlf: 155 (Not: Ji kûderê hûn bigerin, bê pere ye).

**Ji Kurdistana Azad**
**S. AZAD**

## NASNAMEYA KURDISTANA AZAD

**Nifûs:** Nifûsa Kurdistana Azad (Piştî birîna elektrîk, avakirina saziyan û paqijiyê) bi texmînî wê 1.5 mîlyon be. 400 hezar leşker, 100 hezar tîmên taybetî, polîs, bekçî û maliyên wan, 200 hezar sîxûr, îtirafçî û felan û fîlan. 500 hezar cerdevan, zar û zêçên wan (**Dîkkat:** Hejmara mişkan, sîsalkê gurî, seg û dahşê di nav naxirê de ne tê de ne, DÎE). Yê mayî, heke ku bimînin, kal û kûtê Kurdistanê ne.

**Dîn (Ol):** % 95 xwedê nenas in. % 3.8 ne musliman in û yê din jî Hizbik (Di lîteretura dînan de beşekî wiha tune, Diyaneta Tirkiyeyê) in.

**Aborî:** Bi piranî, aboriya Kurdistana Azad, meaşê cerdevanan û eşyayê ku hêzên leşkerî, di sergirtina gundan de dixe destê xwe, ew e. Ji bilî van, hêk û mirîşkên ku cerdevanan dizîne jî, di nav aboriyê de cihekî mezin digirin.

**Rêveberî:** Rêveberiya Kurdistana Azad, ji ya dinyê cihêtir e. Serokwezîr an serokkomar tune. Ji dêla vê sîstemê; her bajar ya jî gund bi serê xwe ye. Mesela dibe ku Sercerdevanek bibe berpirsiyarê herêmekê, lê gava leşkerekî (Tirk) qûngenî bête herêma wî, tu qîmeta Sercerdevan namîne. Bi gotineke din li Kurdistana Azad kes nizane rêveberiyeke çawa heye. Carinan rayedarên TC'ê jî ecêbmayî dimînin ku haya wan (û ya dinyayê) jî ji van qanûnan tune. Her komarek taybetiyeke wê divê hebe, loma rêveberiya KKKC'yê jî cihê ye.

**Coxrafya:** Hidûdê Kurdistana Azad, her çiqas di nav nexşeya TC'yê de be jî, carinan ev nexşe fireh dibe, heta nava hidûdê dewletên cîran (Iraq û Iran) dirêj dibe.

## Jûjî...

Doğan Güzel



**...........NÛÇEYÊN CENGÊ...........**

# Gerîla bersivê dide hovîtiyan

■ *Di hilbijartinên Adarê de hêzên dewletê, bi balefirên xwe zêdeyî 50 gundiyên Kurd bombebaran kirin û kuştin. Sedema vê yekê, wek herkes dizane, helwesta wan gundiyan (tevî gelê Kurdistanê) ya li hemberî hilbijartinê bû. Diyariya gelê Kurd protestokirina hilbijartinê bû, lê ya dewletê bombeyên ji balefiran bûn.*

**Navenda Nûçeyan–**

**23 Adar 1994–** Li Amedê kesên nenas, li Taxa 5 Nîsanê karkerek kuşt. Di vê êrîşê de Hamit Soner (23) bû hedefa kesên nenas,

Hêzên leşkerî, di 21 û 22'ê Adarê de girtin ser gundên Hezo û yê Bismilê. Di sergirtina gundên Hezo (Malegir, Şabê, Narkiye, Liçîka, Kanîkê û Selîbê) de hêzên leşkerî ji gundiyan daxwaza beşdarbûna hilbijartinê kirin û bi gundşewitandinê ve ew tehdîd kirin. Ji hêla din ve li gundên Bismilê (Sergawrê, Mîrzabega, Tirbaspiyê û Dewrêşiyê) jî hêzên leşkerî ji bo hilbijartinê ev daxwaz ji gundiyan kirin. Li van gundên Bismilê 11 kes jî, ji aliyê hêzên leşkerî ve hatin binçavkirin.

Hêzên dewletê li Dîgorê, ku li ser Qersê ye, di 20'ê Adarê de 4 kes (berendamê serbixwe Ali Ayman jî di nav de) binçavkirin.

Li devera Dalıtepe, ku di nav hidûdê Çepekçûrê de ye, di navbera gerîlayan û hêzên leşkerî de şer derket. Di şer de 2 leşker mirin.

Li Amedê buroya hilbijartinê ya Partiya Riya Rast (DYP'ê) hate bombe kirin. Di bombekirinê de 2 kes birîndar bûn.

**24 Adar 1994–** Li Êlihê di navbera du komên Hizbûllah, Menzîl û Îlim de di 22'ê Adarê de dîsa şer derket, 2 kes (Abdullah Küçükaslan û Mehmet Halit Aslan) mirin û 2 kes jî birîndar bûn.

Hêzên dewletê li Çiyayê Çemçê ku di nav hidûdê Qaqizmanê de ye, operasyonên xwe didomînin. Di van operasyonan de hêzên dewletê, ji 5 gundên Qaqizmanê (Akçay Bêrej, Mêstaf, Qercewêr,) ku li ser Dîgorê ne, 11 kes (8 jin jî di nav de) binçav kirin.

Li gundên Semsûrê (Çakal û Dîlkiyan) û yên Rihayê (Yalçınkaya û Düzova) di 23'ê Adarê de hêzên dewletê 116 kes binçavkirin.

Li gundê Zinarê, ku li ser Mêrdînê ye, mayin li ber erebeya cerdevan teqiya, 5 kes birîndar bûn.

Cerdevanan, li ser riya Girêsor û Amedê kamyonek şêlandin. Eynî cerdevanan 10 roj berê kamyona Mecit Türkmen şêlandibûn û dest danîbûn ser 10 milyon perê wî.

**25 Adar 1994–** Li Meydana Xiya ku li ser Sasonê ye, di 23'ê û 24'ê Adarê de di navbera gerîlayan û hêzên dewletê de şer derket. Di şer de 14 cerdevan û gerîlayek mirin. Li Hasköyê, ku li ser Mûşê ye, konvoyek leşkerî kete kemîneyeke gerîlayan, du serbaz (üsteğmen û astsubayek) mirin û 2 leşker jî birîndar bûn. Ji hêla din ve li gundê Axsîsê, ku li ser Hîzanê ye, di navbera gerîlayan û hêzên dewletê de şer derket. Di şer de 4 gerîla mirin û gelek leşker û cerdevan jî birîndar bûn.

Li Amedê lêzimê mebûsê Partiya Riya Rast (DYP) Salim Ensarioğlu, Abdullah Aydın, ji aliyê 2 kesan ve hate kuştin.

Di 23'ê Adarê de du cendek, li nêzî gundê Erbanê, ku li ser Qoserê ye, hatin dîtin. Nasnameya van herdu kesan nehatiye tesbîtkirin.

Hêzên dewletê, ji 17'ê Reşemiyê ta îro 7 gundên Pasûrê û Farqînê xistine bin ablûqayê. Navê van gundan ev in: "Reşikan, Emerkan, Axikan, Eliyan, Remdankan, Kerênapiştaçiyan û Xweşikan."

Li Bilîsê hêzên dewletê, astengiyan derdixin pêşiya gundiyan û nahêlin titûnê gundiyan bê firotin.

Li Amedê û Serêkaniyê (Ceylanpınar), hinek kesan êrîş birin ser buroyên hilbijartinê yên ANAP û DYP'ê. Di êrîşa Amedê de (ANAP) Abdurrahim Doğan mir û di ya Serêkaniyê de jî (DYP)'ê jî 4 kes birîndar bûn. Êrîşa Serêkaniyê ji aliyê ARGK'ê ve hatibû çêkirin.

**26 Adar 1994–** Tîmên taybetî li gundê Axkîsê, ku li ser Xizanê ye, 6 gundî dan ber guleyan, 5 kes mirin û yek jî birîndar bû. Piştî kuştina gundiyan, tîmên taybetî gundê Axkîsê û gundê Ûsê şewitandin.

Li ser banga PKK'ê ya protestokirina hilbijartinê, 14 berendam ji berendametiyê vekişiyan.

Di 25'ê Adarê de li nêzî navçeya Farqînê, di navbera gerîlayn û hêzên dewletê de şer derket, 5 leşker û gerîlayek (bi navê Rêber) mirin.

Ji bo cejna Newrozê û hilbijartina Adarê hêzên dewletê di 20 û 23'ê Adarê de li navçeya Göleyê, ku li ser Ardahanê ye 100 û li gundê Semsûrê jî gelek kes xistin binçav.

Hêzên dewletê li gundê(Emrût) Qoserê, ku li ser Mêrdînê ye, 4 kes (Abdulkadir Yaman, Ali Yaman, Davut Yaman û Ali ku paşnavê wî nehatiye tesbît kirin) binçav kirin.

Li Girêsor di 24 û 25'ê Adarê de hin kesan, molotof kokteyl avêtin dibistanan. Ji van ya di 25'ê Adarê de li hemberî dibistana Vakif İlkokuluyê hatibû bikaranîn teqiya û gelek xesar da dibistinê.

**27 Adar 1994–** Di 25 û 26'ê Adarê de hêzên dewletê, li gundê Şaxê û Heblerê, ku li ser Cizîrê ne û gundên Şirnexê (Bêavê û Bêsûkê), Banê (Gêwer) û Qilabanê (Şirîş) bi balafiran û helîkopteran ve bombe kirin. Di bombekirina gundên Cizîrê de 4 kes mirin. Di bombekirina gundên din de jî (26'ê Adarê) 48 kes mirin û bi dehan kes jî birîndar bûn. Di bombekirinê de her çar gund jî, bi bombeyan xerab bûn.

Cendekê Hurşit Sabaşı, nezî gundê Qûndizê, ku li ser navçeya Xîzanê ye, li nêzî gundê wî hate dîtin.

Wek tê zanîn di 25'ê Adarê de tîmên taybetî girtibûn ser Qûndizê û gelek kes binçav kiribûn.

Li Nisêbînê mala karkerekî belediyeyê (Hamit Tunç) jî aliyê hin kesên nenas ve hate şewitandin.

Li Amedê hin kesan, avêtin ser polîsên ku li ser sondoqa nemro 121'ê ne 2 polîs birîndar bûn.

**28 Adar 1994–** Di 26'ê Adarê de wasiteyek li ber gundê Karacalarê ku li ser Farqînê ye, li mayinê qelibî, 2 leşker û şofêrê wasitayê mirin û 3 leşker jî birîndar bûn. Li navçeya Çinarê, ku li ser Amedê ye, wasitayek li mayinê qelibî. Di wasiteyê de muxtarê gundê Tilwar Yusuf Kaya û 3 kesên din mirin.

Ji hêla din ve li nêzî gundê Dumanlıyê, ku li ser Hezexê ye, kamyonek li mayinê qelibî, 10 kes mirin. Vê kamyonê, ji bo leşkeran erzaq dibir û ew kesên ku mirin jî cerdevan bûn.

Di 25'ê Adarê de tîmên taybetî girtibûn ser gundê Xîzanê, ku li ser Bedlîsê ye, 6 gundî dabûn ber guleyan û kuştibûn. Piştî vê bûyerê cendekê 3 gundiyên din jî di Çemê Kesan de hate dîtin.

Gerîlayên ARGK'ê, boriya neftê (petrolê) ya di gundê Kiradiye re derbas dibe, rûxand. Di 26'ê Adarê de gerîlayan ev borî rûxandin û di bombekirinê de gelek neft şewitî.

Li Comaniyê (Atabağê), ku li ser Sêrtê ye, li ser sindoqa hilbijartinê şer derket, Şemdin Lale mir û 6 kes jî birîndar bûn. Ji hêla din wasitayek leşkerî, ji bo ku hilbijartinê kontrol bike, li ber gundê Eynkumê li mayinê qelibî, 4 leşker birîndar bûn.

Li Ziyaretê, ku li ser Xana Hewêleyê, ji bo hilbijartinê di navbera cerdevanan de şer deket, 4 kes birîndar bûn.

**29 Adar 1994–** Wasitayek cerdevanan di 27'ê Adarê de li nêzî Tabûra leşkerî ya Kadînê ku li ser Qilabonê ye, li mayîna gerîlayan qelibî, 5 cerdevan mirin û 7 heb jî birîndar bûn. Li gundê cerdevanan Kevgirkê jî, ku li ser Kerboranê ye, wasitayek li mayina gerîlayan qelibî, 3 cerdevan mirin û 6 heb jî birîndar bûn.

Gerîlayên ARGK'ê di 28'êAdarê de avêtin ser Tabûra leşkerî ya Şitrozan ku li ser Çelê (Çukurova) ye, 2 leşker mirin û 6 polîs jî birîndar bûn.

Gerîlayên ARGK'ê di 28'ê Adarê de girtin ser Kadun û Kirarê ku li ser Qilabanê ne. Piştî sergirtinê hêzên leşkerî dest bi operasyonan kirrin. Di operasyonan de 3 leşker, cerdevanek û gerîlayek (ji Qilabanê bi navê Bedri) mirin.

Ji hêla din ve li devera Omeriyan, ku di nav hidûdê Mêrdînê de dimîne, di 28'ê Adarê de di navbera gerîlayan û hêzên dewletê de şer derket, 2 leşeker mirin.

Wasitayek tîmên taybetî, li ser riya Îdir û Qaqizmanê kete kemîneya gerîlayan, 2 tîmên taybetî mirin.

Li Êlihê di navbera du komên Hizbullah (Îlim û Menzîl) de du êrîş pêk hatin. Di êrîşa yekemîn de li Taxa Kismetê R.S (15) û di êrîşa duyemîn de, li cem Camiya Hacî Şirîn Nîmet Toprak (28) hate kuştin.

# NÊRÎNEK

**M. Alî Tüysüz**

## Kurd çi dixwazin?

Wek hemû neteweyên din gelê Kurd jî dixwaze azad bijî. Dewleta Tirk wateya gotina azadiyê naxwaze fêm bike. Ji bo gelê Kurd azadî çi ye? Helbet gotina azadiyê ji bo Kurdan û hemû mirov û gelên azadîxwaz tê wateya destxistina mafan. Maf dikare pirr alî bê muneqeşekirin û nirxandin. Mirov dikare li vir behsa mafên mirovahiyê, behsa mafên demokratîk û aborî bike. Mafên neteweyî jî pir caran dikare bi mafên din yên jorîn ve tev bê şîrovekirin. Ji bo gelên ku xwedî dewlet, al û zimanê xwe ne, dikare azadî di warê demokrasiyê, an jî mafên mirovan de tunebe. Ji bo gelên ku gihîştine mafên xwe yên neteweyî û demokratîk dikare pirsa mafên aborî pirseka herî girîng be.

Mirov dixwaze ku mafên di destê gelê Kurd de hene li jêr rêz bike. Le çi mixabin qet tune ne. Ji bo vê jî emê mafên girîng ku gelê Kurd ji bo wan ev sed sal in ku xwînê diherikîne, li jêr wek çend xalan diyar bikin.

- Mafê axaftinê: Mafê gelê Kurd tune ye ku bi zimanê xwe bipeyive. Ne tenê bi zimanê xwe lê belê bi zimanên din jî gelê Kurd nikare rewşa xwe ji bo mirovatiyê diyar bike. Ji derveyî îdeolojiya fermî ji bo gelê Kurd diyarkirina bîrûbaweriyan, qedexe ye.
- Mafê nivîsandinê: Gelê Kurd nikare bi zimanê xwe binivîsîne. Bi zimanên din jî heqê gelê Kurd tune ye behsa mafên xwe bike.
- Bi Kurdî hîndekarî û perwerdehî qedexe ye. Dibistanên Kurdan tune ne.
- Stran, reng û edetên me qedexe ne. Ala gelê Kurd qedexe ye. Pîrozkirina rojên me yên neteweyî û şevên şahî qedexe ne. Bi def û zurnan dawet çêkirin qedexe ye.
- Damezirandina rêxistin, saziyên kulturî û partiyên siyasî qedexe ye. Xebata siyasî, kulturî, folklorî û ronakbîrî qedexe ye.
- Mafên jiyanê tune ye. Her roj bi dehan mirovên Kurd têne kuştin.
- Rexne û gotarên ku ne demokratbûna sîstemê, bi xwe re dikin babet qedexe ne.
- Şivan û gavantî îro li welêt qedexe ye.
- Kurd li welatê xwe ne azad in. Yanê dewlet zilm lê dike, lêdixe, digire, işkence dike, dikuje, darve dike. Her kesê ku xebata siyasî dike bi salan ceza dixwe û di zîndanan de dinale.
- Ji bo dewletê her kes Tirk e. Kurd, Kurdî, welat û kultura Kurdan tune ye. Her Kurd mecbûr e xwe wek Tirk bibîne û bihesibîne. Her Kurd mecbûr e Atatürk wek Xwedê bibîne û bihesibîne.
- Tu heqê Kurdan tune ye ku behsa mafên neteweyî, demokratîk, mirovahî û aborî bike û van bixwaze.
- Kî ji bo van mafên jorîn xebatê bike û van biparêze dikare bê girtin, işkencekirin û kuştin. Dewlet, hêzên dewletê, cerdevanên dewletê di vî warî de her tim xwediyê maf in.

Mirov dikare lîsteya mafên ku Kurd jê bêpar in, dirêj bike. Helbet ev hemû ji bo me Kurdan mafên neteweyî ne. Hemû ferdên Tirk çendekan ji yên jorîn derxe xwediyê van mafan in. Di eynê wextê de ev mafên demokratîk û mirovatiyê ne jî... Dewleta Tirk wexta ku dibêje gelê Kurd "xwediyê her mafî ye", bibe nebe maf û metodên dewletê ku Kurd anîn vê rewşê tê bîra mirovan.

Helbet di van çend salên dawîn de gelê Kurd bi hêza xwe hinek maf standine. Roja ku gelê Kurd van heqan hemûyan bistîne wê xwe wek gelekî azad bibîne û bihesibîne. Divê bête zanîn ku heta ev maf neyên standin, wê xebat û şerê gelê Kurd bidome.

# Hesen Mizgîn û Armanc li kîjan aliyî ne?

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

*Hesen Mizgîn împeryalîzmê dike dijminê xeyalî. Ez ji Hesen Mizgîn dipirsim: "Ji Kurdan pirrtir kê zerar ji împeryalîzmê dîtiye? Li ber çavan e, PKK neçûye mudaxeleyê berjewendiyên Amerîka, Fransa, Brîtanya û Almanyayê nekiriye û quweta wî jî pê nagihêje. Ev dewlet bi xwe hatin û tên Rojhilata Navîn û mudaxeleya qedera gelê Kurd dikin. Duh jî ev dewlet bûn, bi taybetî jî Fransa û Brîtanya bû ku Kurdistan di nava xwe û dewletên herêmê de parve kirin. Îro jî van dewletan dest daniye ser qedera gelê Kurd û dibêjin statuya ku me ji bo Rojhilata Navîn çêkiriye nayê guhertin.*

Bilindbûn û pêşveçûna têkoşîna rizgariya neteweyî û hatina wê ya qonaxeke nû, di serî de împeryalîzmê û welatên kolonyalîstên dagirker û hemû rêxistin û heta kesan jî, mecbûrî diyarkirina raya wan a li ser vê têkoşînê dike.

Ji ber ku li bakurê Kurdistanê alternatîfeke din nîn e, rêxistinên din bi xwe jî nikarin bibin alternatîf, mecbûr in di navbera dagirkeran û PKK'ê de tercîhekê bikin. Hinek kes û rêxistin, bi diyarkirina ramana xwe di sefên welatparêz de cih digirin, hinekên din jî, bixwazin an jî nexwazin, ew û dewleta Tirk di warê ramanê de li dijî PKK'ê tên, li ser xetekî eynî zimanî bi kar tînin û li aliyekî cih digirin.

Kovara Armanc û hinek nivîskarên wê li ser xeta li dijî PKK'ê û nêzîkî dewletê ne. Wek Hesen Mizgîn.

Hesen Mizgîn çend hejmar berê di rojnameya Armancê de li dijî yekîtiya Kurdan derketibû û damezirandina eniya neteweyî wek nepêwist dinirxand.

Di hejmara Armancê ya 145'an de dîsa Hesen Mizgîn di der barê HEP, DEP û PKK'ê de nivîseke din jî weşand. Mirov dikare nivîsa wî di çend xalan de bicivîne.

– Sansûra PKK'ê ya li ser çapemeniya Tirk
– Dijminê xeyalî, împeryalîzm
– Girêdana HEP û DEP ya bi PKK'ê re û bêdengiya wan
– Biryara YEKBÛN'ê ya damezirandina partiyeke legal.

Xala yekem li ser qedexekirina çapemeniya Tirk li Kurdistanê ye. Ez dibêjim Hesen Mizgîn xurifî ye. Hemû kesên demokrat û pêşverû jî qebûl dikin ku, di dîrokê de çapemeniya Tirk tu car azad nebûye, çapemeniyê li Kurdistanê bêsansûrkirina dewletê jî, siyaseta dewleta dagirker ya Kurdistanê bêkêmasî parastiye. Çapemeniya Tirk, beriya qedexekirina PKK'ê jî, beyanên waliyê herêmê Ünal Erkan diweşandin, piştî qedexekirinê jî eynî tişt dike.

Ji artêşa Tirk bigire heta partî, sendîka û hemû çapemeniya Tirk di binê serokatiya Doğan Güreş de, li ser xeta neteweya Tirk, li dijî Kurdan lihev kirine. Li ser vê yekê çapemeniya Tirk wêrankirina bajêr, navçe û 900 gundên Kurdistanê û kuştina 1300 kesên welatparêz ji aliyê kontgerîla ve nedît û nebihîst û îro jî nabîne.

Ji damezirandina Komara Tirkiyê vir ve tenê yek azadiyeke çapemeniyê hebûye; dijminiya Kurdan kiriye û îro jî ev dijminiyê li dijî PKK'ê dike. Gelo Hesen Mizgîn kor e, nabîne?

Tansu Çiller jî weke Hesen Mizgîn digot: "PKK ji bo ku, kirinên wê dernekeve holê qedexe daniye ser çapemeniyê."

Hesen Mizgîn împeryalîzmê dike dijminê xeyalî. Ez ji Hesen Mizgîn dipirsim: "Ji Kurdan pirrtir kê zerar ji împeryalîzmê dîtiye? Li ber çavan e, PKK neçûye mudaxeleyê berjewendiyên Amerîka, Fransa, Brîtanya û Almanyayê nekiriye û quweta wî jî pê nagihêje. Ev dewlet bi xwe hatin û tên Rojhilata Navîn û mudaxeleya qedera gelê Kurd dikin. Duh jî ev dewlet bûn, bi taybetî jî Fransa û Brîtanya bû ku Kurdistan di nava xwe û dewletên herêmê de parve kirin. Îro jî van dewletan dest daniye ser qedera gelê Kurd û dibêjin statuya ku me ji bo Rojhilata Navîn çêkiriye nayê guhertin.

Dr. Qasimlo heta dawiyê bi siyaseta dewletên Rojava ve girêdayî bû û heta dawî jî Sosyal demokrasî diparast. Lê cardin welatên împeryalîst, rejîma meleyên qirêj, genî û barbar tercîhê wî kirin û tu alîkarî nedan Qasimlo. Heta wan ew neparast û rejîma hov ya Îranê ew kuşt.

Ne pêwist e ku em bibêjin hemû çekên modern yên dewleta Tirk ji van çar dewletên împeryalîst tê û hemû Kurdistan bi van çekan tê wêrankirin. Hemû kesên ku tu têkiliya wan û siyasetê bi hev nîn e dizanin û li ber çavan e ku, şîrketên welatên rojava bi hemû çalakiyên xwe ve çek û heta çekên kîmyewî jî dabûne rejîma Sedamê barbar û bi van çekan jî qetlîama Helepçeyê hate pê û 183 hezar însan ji holê hate rakirin. Lê, tu dewletên împeryalîstên "xeyalî" yên Hesen Mizgîn ev barbariya Sedam heta şerê Xelîcê protesto nekirin. Ku îro jî alîkariya împeryalîzmê nebe, wê kolonyalîstên Tirk çiqas li ber xwe bidin?

Hesen Mizgîn dibêje, "Ji ber ku HEP û DEP bi rêxistinên îlegal ve girêdayîbûn, PKK û PSK jî bê tolerans bûn, di xebata legal de bi ser neketin." Hesen Mizgîn li vir muxbîriyê dike. Ew dizane ku der heqê DEP'ê de dawa girtinê hatiye vekirin, bi zanîn li ser pirsa DEP'ê û îlegalîteyê radiweste. Ev îdîayeke ne tesadufî ye. Di dawa Nusret Demîral de jî eynî îtham hene. Tansu Çiller û Ünal Erkan jî der heqê DEP'ê de weke Hesen Mizgîn diaxifin. Dibêjin: "Heke DEP li dijî PKK be, tu pirsgirêkên me pê re namînin." Hesen Mizgîn gotina wan, bi vê îdîaya xwe dubare dike.

Weşan û berpirsiyarên dewleta Tirk gelek caran li dijî PKK'ê hinek tişt ji PSK'ê jî xwestin. Lê, bi qasî ku min di çapemeniyê de xwend, guhdarî û temaşe kir û bihîst, dîtina PSK'ê ya li ser PKK'ê cihê bû lê, ne wekî dîtina dewleta Tirk bû. Ya Hesen Mizgîn jî cuda ye, lê wek ya dewletê ye.

Hesen Mizgîn li dijî şeklê damezirandina HEP û DEP'ê derdikeve, lê ew jî alternatîfeke cihê nayine û dibêje wê partiyeke legal ji aliyê YEKBÛN'ê ve bê damezirandin. Xuya ye ku Hesen Mizgîn YEKBÛN'ê wek rêxistinek îlegal nabîne. Lê, ez bixwe jî dibêjim, dema ku li dijî PKK'ê be, ji xwe ne pêwist e ku YEKBÛN partiyeke legal damezirîne, ew bixwe dikare bi navê xwe bibe legal. Berpirsiyarên dewleta Tirk bixwe dibêjin, "Em ne li dijî Kurdan û partiyê wan ên li dijî PKK'ê ne, em tenê li dijî PKK'ê ne." Dema ku YEKBÛN li dijî PKK'ê be, dê wê deynin ser ser û çavên xwe. Heta dikarin YEKBÛN'ê bi Îskender Ertos, Mustafa Zeydan, Sedat Bucak, Tahir Adiyaman û bi Elîxan Tatar jî teqwiye bikin û li bin logoya Armancê jî binivîsin: 'Organa Komîteya Navendî'.

**Wahap SERÎN**



# Newroz

***(Soranî)***

Roj le asoy sûr şewq edatewe
Delê emsalîş Newroz hatewe

Sirûşt serpakî ciwanî deniwênê
Wek bûkî razaw xoy dexemlênê

Deşt û kwêstan û lûtkey berzî kêw
Bizey "Behar" yan kewtote ser lêw

Befrî tiwawey ser şaxî tembar
Ebê be firmêsk çor–çor dête xwar

Hajey şetawî bin kwêstanî berz
Gaberd detilênê, kej dênête lerz

Kî jî daristan le şayî çema
Be mûsîqay aw dênewe sema

Bax û rezî şax yan mêrg û çîmen
Xişlî razawey bijwênî dîmen

Sewzayî deşt û zincîrey kwêstan
Tarîf nakirê ciwanî Kurdistan

Kewî dildarî azadî û ciwanî
Derûnî keylî sozî goranî

Berî hesretî dil ekatewe
Bangî perawqer deng edatewe

Le ser Qendîl û Şaho û Nekeroz
Elê gelî Kurd "Newroz" tan pîroz.

**FERHENGOK**

**Aso:** Şefeq, beyanî zû
**Sûr:** Sor
**Delê:** Dibêje
**Emsalîj (an emsalîş):** Vê salê jî
..... îj; ..... îş: ...... jî
**Sirûşt:** Natûr, tebîet
**Eniwênê (Diniwêne):** Nîşan dide
**Razaw:** Xemilî
**Kwêstan:** Çiya
**Xoy:** Xwe
**Lûtke:** Bilindiya dawî
**Kêw:** Çiya
**Lûtkey berzî kêw:** Bilindtirîn xala çiya
**Bize:** Kenîn, kena sivik
**Befrî tiwawe:** Berfa heliya
**Tiwan, tiwandin, tawandin:** Helîn û helandin
**Şaxî tember:** Çiya bi mij
**Firmêsk:** Rondik
**Ebê be firmêsk:** Dibe rondik
**Haje:** Denga bilind (ji avê)
**Şetaw; Şet+av:** Ava gir, lafaw
**Gaberd:** Berd an kevire mezin û girs
**Etilêne (detilênê) ji tilandin:** Herekandin, hejandin
**Kej:** Çiya
**Kîj (qîz ji kîj hatiye):** Keç
**Sema:** Reqs, dans
**Çîmen:** Şînayî
**Derûn:** Hundir
**Keyl:** Bi şewq, bi soz, bi hul
**Soz:** Şewq
**Goranî:** Stran
**Ekatewe (dekatewe):** Vedike
**Qendîl, Şaho û Nekeroz:** Sê (3) navçeyên Kurdistan in
**Newroztan:** Newroza we

**Werger ji tîpên Erebî: Mediengruppe Kurdistan, Berlin**

ÇÎROK

# Bila mirov bibe conegayê rojekê nebe çêleka çil rojan

Heta van salan, şahiyên bi civakî kêm bûn li welatê me. Bindestî ji şahiyê re jî heye. Bi ya min di nava Kurdan de şahiya pir mezin ew bû ku zarokên wan ji leşkeriyê bizivirin (vegerin), a din jî zewaca xort û keçikan bû. Van herdu tiştan şer û deng dida.

Leşkerî bi xortan pir zor dihat. Carina bi ser hev diketin:


– Heta tu herî ji Tirkan re leşkeriyê bikî, xwe biavêje ava Mûradê.

Ê ku salên wan ji çilî derbas bûne tim qala leşkeriya xwe dikirin. Tê bîra min, ji bo şerê Qibrisê seferberî çêbûbû, gund bi gund diçûn, bi rê dikirin. Xortan ax dikir nava kincikekî sor û dikirin bêrîka xwe. Xanê bi girîn ji wan re got: "Ma yê me çi... Xwedê çima qebûl dike? Wextê xelayê jî wiha bû... Pepûk ez im. Werin nerin... nerin berxê min, nerin..."

Bi rê ve min ji diya xwe pirsî: "Wan çima ax bi xwe re bir?" Diya min bersiv da: "Ku bimirin bi axa welatê xwe re dimirin."

Dîlan jî girîng in. Van salên dawî dîlan bûne serhildan, ji xort û keçikên dilovan re. Li gund govend hebû. Ez û malbata xwe em çûn dîlana Ferat.

Ketibû serê dîlanê. Desmala sorgewez dihejand. Wek hîva biriqî bû. Çav li min ket, bi dev û rûkenî hat. Pirsa wê ya pêşî ev bû: "Li wan deran çi heye çi tune?" Vê pirsê cihekî pir mezin girtiye di jiyanê de.




Dengekî sîtemkar û tijî dest pê kir û got:

– Gundê me çelqo belqo ye. Di ber bajêr de ye. Zarokên wan ji welatên din hinek diravan dişînin. Bi qûtekî nemir dijîn. Dibe sibe diherin bajêr, dema bû êvar tên. Jiyana gemarî dilê piran kiriye wek teniyê. Heta doh, ji bo qevşekî giha, ji bo bihustek erd mêr dikuştin, îro dev lê hatine girtî. Pûç bûne, haya wan ji wan tune, gişt ne wiha ne. xort û qîz wek pola ne. Ê ku hînî parsekî, xwînxwarî û zordestiyê bûne pir durû ne, kîjan alî xurt be, bi wan re ne. Bila mirov conegayê rojekê be, nebe çêleka çil rojan.

Em rabûn. Çavê wî yên mezin tije bûbûn. Lawê wî hat, ji lawê xwe re got:

– Here malê. Bû çend car ji te re dibêjim, dijmin xedar û kêmfersend e... Ê ew e, ew e...

Lêwik peyivîn qedand:

– Lê navê te çi ye...

Xort û keçikan bi hev re gazî wî kir. Ket dîlanê. Kilama: "Wî kişe kişe, kiş mirîşkê, wî diranê min diêşe wirîşkê.." got. Dû re (li dû, paşî) got:

– Me heta îro derdê xwe ji mirîşkê re got. Lê îro... Lê îro... Lêxin birano lêxin... ha bi hev re... ha bi hev re...

Dîlan belav bû. Min berê xwe da çem û ez çûm. Heta çend salan berê navê wî "Lawê Lala dîn" bû. Di çavên dewlemend, zordest û feodalan de gêjek bû.

Min pişta xwe da dara biyê, ponijîm. Jîn wek zeviya bîndayî ye, ku hat ajotin dibe şahî. Dengê beq û reqê şahiya şevê bû. Vegeriyam li gund mêze kir. Dilê min digot rabe, biqîre û bibêje:

– Lawo zirto, ma te çi kir; ço li destê te bû, bora bora te bû. Jina te rind bû ji te hez nedikir, mêrg û erdê te pir bûn te nedigot, navê te bi derewa beg bû, te pale dixebitandin pale birçî bûn. Lawê Lalê ne tiştek bû! Îro tu şaş bûyî. Mêzeke çem xwîn diherike. Te bixwesta mêr dikuşt, jin dida berdan, gund dişewitand. Tu mirî yî! Qey laçika jina te li serê te ye?! Mêro!

Te bi fîstan û şekirê nav kaxizan jinik dixapandin. Heso û Huso bi çend berxan dikir xulam, keya tu bû. Peyvên te "Tîpê nava Quranê bûn! Lawê Lale nayê xapandin ne wisa ye?.. Tu mirî yî.. Tu mirî yî.. Xayinî û xerabî mirine... Lawê Lalê guldana gund e. Gundînooo! Çavên we bi ronî.

Rûniştina li ber çem xweş e birano. Ava sar xweş e. Hêşinayî û serbilindiya welêt xweş e. Ku mirov bizanibe rûne, bizanibe mêzeke, bizanibe hezbike...

Rabûm, ber bi malê ve meşiyam, li ber derî ji rêça kadiz û stêrka mêrê şevê re min dest hejand. Ew ê gelan bi giştî bûn...

**Cîhan ROJ**

# Ezê ji bo kê û çima binivîsim?!

Mirovahî, demokratî, biratî û aştî; bêguman peyvên şêrîn in. Dîlan heneke dikin. Lê mixabin, ez nikarim ji bo wan bêjeyekê binivîsim. Li welatê min sorgulên nû bişkivî, lale û beybûnên buhiştê bi gazên jehrê diçilmisin. Şirmijên bêguneh dibin nîşangeha guleyên bê bext. Qîz û xortên ciwan di bin zincîrên panzeran de diperçiqin. Bûkên nûrojî êrîşa hirç û hovan e. Êdî candar jî, ji welatê min koça xwe bardikin. Ji ber dengê top û firokan direvin. Ji ber mirinê koç dikin.

Gelo di nava agirê dojehê de bayê buhiştê yê hunik pêl dide?!

Li civatên Ahrîmanan Hurmiz çi dibêje?

Ji min nexwazin ku ez binivîsim. Ji ber ku dûmana bombeyan bi ser çiyayên min ve dadikeve, aştî ji bo min xwe sipartin e. Wekhevî, biratî û demokratî sextekarî ye. Ji bo mirovahiya sexte û şermedar ez nanivîsim. Ma çawa ezê binivîsim û qîj û hawara çardeh saliyên min di nav destên faşîstan de perdeyên asîmanan diçirînin. Karwanê sêwiyên bêdê û bav, dayikên çarî reş, kalên sêwî, awirên jinebiyan tev mirovahiyê tewanbar û şermedar dikin.

Ez nanivîsim! Qîlêşa min wê ji bo min bibe pênûs. Ezê bi agirê hêrsa dilê xwe cîhanê tev renge reng bixemilînim. Bila dinya tev bibêje min "terorîst" e (?). Zora li hemberî terorîst û hovan şeref e. Navê wê zora şoreşgerî ye. Sexetakar pir in, bila ji bo aştiya sexte binivîsin. Lê ez, na, ezê ji bo şer û cengê binivîsim. Ezê ji bo qeflên jinebî û refên sêwiyan binivîsim. Ji bo beybûn û binefşên ku diçilmisin, ji bo refên xezalên ku ji welatê min koç dibin, ji bo bûkên xêlî reş û dergûşên vala, ezê binivîsim. Lê tu caran ji min nexwazin ku ji bo aştî û demokrasiya sexte, ji bo biratiya derewîn binivîsim.

Dibe ku gelek ji min loman (gazinan) bikin û rexneyan li min bigirin. Hingê bi tenê daxwazeke min ji wan heye. Bila herin Şirnex û Cizîrê ji dayîkên çarî reş bipirsin. Bila ji dayîkên Licê bipirsin. Bila ji xêliyên bûkên Kurdistanê ku di sepetan de dirizin bipirsin. Ji hêstirên ku di çavên zarokan de mane asê bipirsin. Eger van pirsa ew têrnekirin, dikarin bost bi bost ji xaka Kurdistanê ku her bostek bûye gora bi dehan şehîdên bênav bipirsin. Ji gul, beybûn, dar û daristanan bipirsin. Bila ji her tiştê welatê min bipirsin. Bê guman wê bersivê bigirin.

Dema ez radihêjim pênûsa xwe tîrêja awirên zarokên Helepçe, Qela Diza, Şirnex û Licê xwe li çavê min dide. Hêstirên dayîkan mîna gulokên agir xwe li dilê min didin. Dûmanê bombeyan ramana min tewş dike. Peyvên paşayên mirinê, şahinşahên demokratî û aştiyê di mejiyê min de bahoz, bager û firtoneyan pêdixin. Pênûsa min dide qîran. Li ber xwe dide. Dilerize, lê peyvekê nikare bîne ziman.

Cîhan di destê Ahrîmanan de dilerize Ahoramezda nû ji xewa şêrîn hişyar bûye. Li serê çiyayên Kurdistanê destana hebûna xwe diafirîne. Dem bûye doma şer, şerê Ahoramezda û Ahrîman. Pêwist e her kes û her tişt bikeve bin xizmeta Ahora, Keştiya (keleka) Nûh li serê çiyayê Cûdî li Heştanê li hêviya mirovahiya hemdem e. Dema ku karwanê wê bi rê ket û meşiya ezê zorê bidim pênûsa xwe û helbest û destanên bêmirin ji bo aştî, demokratî, biratî û mirirovahiya Ahora–Mezda binivîsim.

**Selîm BIÇÛK**

## Reva bihara 1991'î ya Kurdên Başûr:

# Kesî qêrîna zarokên Kurdistanê nedibihîst

Li dû dawîlêhatina Şerê Kendavê di çavgirtineke bi lez î dîrokî de, gelê Kurd li başûrê Kurdistanê bû kulmeke pola û zendê xwe vemiland. Bûn lehiyeke mezin û tirseke nedîtî ji bo dijmin, ku faşîstê Bexdadê li berê lerizî. Doh bû ku em di nav govendeke renge reng de bûn. Hemû dinya bi çavên xwe yên xwarovîçkoyî ve dît ku çawa, *"Gel bi eşq diçin ber bi mirinê ve"* mirineke ji bo azadî û bextewariya mirov.

Tê bîra min ku em li komeleyê bûn, şeveke geş û pir bi bêhna biharê, meha Newrozê û serkeftinê bû. Min behsa **Hêmin û Komara Mehabadê** dikir. Ku çawa Hêmin dibêje, *"Pir neçû komara me rûxiya û hêlîna me xerab bû."* Yek ji hevalên min got ku: *"Ez zehf ditirsim, ku li me jî wisa bibe û ev serkeftin bibe xewneke xweş û bi lez here."*

Raperîn û serkeftin dest datanî ser milê hemû Kurdistanê û li bejn û bala Newroz û Babagurgur (Kerkûk) dipêça, lê mixabin wek hate gotin xewneke xweş û lezgîn bû, zû hat û zû jî malavayî lê kir, şevên geş û tije bi serkeftin hêdî hêdî gavên xwe sist dikirin û ber bi jêr ve diçû.

*Di destpêkê de bi qirkireneke mezin û xwînrijandineke pir ve Kerkûk dîsa bi dest xistin, egala Erebî avêtin serê û pihîn li şal û şepikê Kurdî dan. Bi hezaran kal, pîr, jin, mînal (zarok) û ciwanên Kurd şehîd ketin... Artêşa kuliyan li ser dexla Kurdistanê dikişiyan û wek sîsalka gurî nikul li mejiyê me dida. Kes tune bû ku dengê me bibe xwe, kesek nebû ku qêrîna zarokên Kurdistanê bibihîze.*

Em li eynî cihî, tevî hevalên xwe di şeveke şawnak (bi saw) li hêviya artêşa kuliyan bûn û em li dora radiyoyekê rawestiyabûn. Piştî ku Kerkûk ji destê Kurdan derketibû, **Hesen Kaşif** û kûçikê Basiyan li Bexdayê ji bo Radiyoya Monte Karlo diaxifî û digot: *"Artêşa dewletê bajarê Kerkûkê ji destê Kurdan standiye, niha li Çemçemal e û sibehê wê ber bi Hewlêr û Silêmaniyê ve here."* Em bi xwe vî çaxî li Çemçemalê rûniştibûn û artêş jî li Kerkûkê bû, lê nûçe ew bû ku em lê bifikirin, lewre ne dijmin bi rewşa me dizaniya û ne jî me bi ya wî.

Di pey de **George Bush**, Serokê Amerîkaya dergûşa tawan (sûc) û planên qirêj di axaftineke xwe de got: "Em ne amade ne ku pîlotekî xwe jî bixin nav şerê hundirîn ê Iraqê, karê me di şerê Kendavê de qediya."

Roja 29'ê Adara 1991'î, de dewleta Iraqê bi artêşeke mezin a ku ji Şerê Kuweytê zivirîbû û pê serhildana başûrê Iraqê (şiiyan) pêlaxtibû; bi plan û bername ve tevî bi hezaran tanq, bi dehan balefirên cengê û fîrokan ve êrîş anî ser Kurdistana birîndar û şehîdan. (Bêguman ji aliyê Amerîkayê ve bi tenê ji bo hundir îzin dabû bikarinîna fîrokeyan).

Di destpêkê de bi qirkireneke mezin û xwînrijandineke pir ve Kerkûk dîsa bi dest xistin, egala Erebî avêtin serê û pihîn li şal û şepikê Kurdî dan. Bi hezaran kal, pîr, jin, mînal (zarok) û ciwanên Kurd şehîd ketin... Artêşa kuliyan li ser dexla Kurdistanê dikişiyan û wek sîsalka gurî nikul li mejiyê me dida. Kes tune bû ku dengê me bibe xwe, kesek nebû ku qêrîna zarokên Kurdistanê bibihîze.

Deng ji me derdiket û dîsa li me vedigeriya. Baran çekeke din a kujyar bû ku di destpêka meha Avrêlê (Nîsanê) de û ya werzeya biharê de pişt li gel şikandibû. Ba û boran seranserî welêt girtibû. Deriyek tu nîn bû ku ev gel bihewanda. Deriyek hebû ew jî mala dijminan bû, Kurd dibêje: *"Neçarî dike ku mirov serî li mala neyarê xwe jî bide."* Li ser sînor û di nav bajarên Îran û Tirkiyeyê de bi awayekî zehf nemerdî pê li hesta bilinda Kurdan dihate kirin, kî heye tufî pasdarê Ecem û jendermeyên Tirk ku li eniya me diket, ji bîr bike? Kî heye destdirêjahiya wan ji bîr bike?.. Kî... Kî...

Di wan êrîşên dewleta faşîst a Bexdayê de gelek kes şehîd bûn, zehf xort û pêşmergeyên dilêr çûn ser dilovaniya xwe. Li bajarê Kerkûkê keçeşêra gel **Cemîle** bi xwe gorîkirinê kir ku destaneke mezin li hemberî dijmin bête nivîsîn.

Li Hewlêr û Çemçemal sê şanoger di şerê parastin û sîpera şerefê de giyanên xwe kirin desteyek nêrgizên gelê xwe. **Cewher Bapîr, Newzad Mustafa** û **Semedê Hacî Hemîd.**



*Piştî ku Sedam ji Kuveytê vekişiya kela têkçûna xwe di serê Kurdan de hêdî kir. Kurd careke din li ber çavê dinyayê di bin şûrê zilma Sedam de derbas bû. Ji bilî rêxistinên mafên mirovan kesî dengê xwe nekir.*

Ew roj me bi xwe şarê (bajarê) xwe li cih hişt, lê car carina wek ku mirov cendekek li dû xwe hiştibe li bajar dinihart. Dûyekî reş û gur esmanê bajêr vegirtibû, ku ev yek jî encama berdewamiya bombekirana balefirên dijmin bû.

Gotinên hevalê min hatin bîra min ku goti bû: *"Ditirsim ku wek Komara Mehabad bê serê me jî."* Di vê dema tehl de, di vê rewşa çewt a siyaseta cîhanê de pê dihesiyan ku çavên min tarî dibûn û nikaribûm pê biavêtima. Pê dihesiyam ku careke din Komara Mehabad û Hikûmeta **Şêx Mehmûdê Berzencî** parî bi parî dihatine kirin. Pê dihesiyam ku ruhên **Şêx Seîdê Pîran** û **Seyid Rizayê Dêrsîmî** di gorê de diperpitin û azar dibînim... Di vî çaxî dê guhê min lê bû ku hevalekî min got: *"Pê biavêje, tanq gihiyan me."*

Çi rojên dijwar bûn. Miletek ax, zeviyên xwe di şûn de dihiştin û ber bi çarenûseke tarî ve rê dikudand. Wax ku mirina bi ciwanî ya firsendên dîrokî ya Kurd tal û bi şewat. Artêşa kuliyan xwe li ser axa zêrîn a Kurdistanê berdabûn û siyaseta durû ya dinê jî lê dinihêrt. Çû û çû ta ku li **Derbendî Korê, Çiyayê Ezmir, Kanî Panke** û yên din şikaya.

Kurd li dijî wê êrîşê, ew kuştinên bi rik tu çekên wî nebûn ku pê bigire û li ber xwe bide. A ku hebû **na** bû. Kurd bûn malbatek, gewdeyek û bi devekî hawar kirim.

Na... Na... Na... Ji serpelkirina ji Sedam re **Na**... Dengê vê **na**'yê referandûmeke dîrokî bû. Ji bo redkirina dewleteke, lê kê guh dayê? Kê?....

Hey dinayaya bêbext! Ew rev bû ku dikaribû wek atomekê te bihejîne. Rev ew şîleya bi hêz bû ku, li nav çavên te ket.

Lê....

**Sîrwan REŞÎD**

# Nanfiroşê Helebçe

## EMERÊ XAWER

Nanfiroş bû
Bi karê destan
Û bi xwêdana xwe
Nan çêdikir
Û nanê xwe
Diderand Emer,
Piştî şeş keçikan
Lawek jê re bû
Dilê sar û bi keser
Geş bû
Pêlên şahiyê
Dane nava wî
Nûka
Şal û şapikên bedew
Bi bejnê de berdan
Dil xweş kir
Bi gerdûnê
Lew bi wêrt bû
Êdî malmîrat naçê
Dê lawik nav lê bidomîne
Hê bêhtir
Xwe da kar
Nan çêkir, nan firot
Xanî lêkir û raxist
Bi merş û tayîjên rengîn
Bi kulavên koçerî
Ji ber ku çavên lawê wî
Nemînin li der


Meha Adarê bû
Gel di kar û bara
Newrozê de ye
Bi gul û çîçekan
Xemilîne deşt û çiyan
Li ser dar û deviyan
Şaqîna çivîkan e
Kolanên Helebçe
Bi hing û ding e
Ji dengê mirovan
Bi jîn û jiyan e
Helebçe...
Şazdehê Adarê
Rojek sayî û vekirî
Roj dikenî
Girênek mezin hat
Ji ezmanan
Teva gotin:
"Ev çi ye?
Ne ewr e ne baran e
Ku dengê tavan be"
Lê firok û balefirên
Sadam bûn
Agir barandin
Û mirin.
Ne bi gule
Bi jehrê kîmyewî
Gul û çîçek çilmisîn
Jiyanê cih da
Xir û xaliyê
Roj li ezmana kete girî

Emer hembêz kir lawê xwe
Ji bo biparêze
Ji guleyan
Lê li der xanî
Gêj bû û ferfitî
Mefer ku ma
Destê xwe li lawê xwe pêçan
Wek kulaban
Û xwe li erdê li ser
Gêr kir bêpîvan
Êdî di wêneyan de
Dijîn Emer û lawê wî
Li çar aliyên gerdûnê
Dineqişînin hêt
Û dîwaran.

**Jîr DILOVAN**



# Qaşo ronakbîr... şoreşgerên... Kurd in



*İsmail Beşikçi*

Gava dengbêjekî ku bi eslê xwe Kurd e û bi Tirkî, Erebî an jî Farisî distire, bi hezaran rexne li wan tên girtin. Ji ber ku ew Kurd in mirov dibêje: "Wey xwelî li serê wan be, çima ew bi Kurdî nastirin."

Gava nivîskarên mîna Yaşar Kemal û hwd. ne bi Kurdî lê bi Tirkî, Erebî û Farisî berhemên xwe yên edebî dinivîsin, ji ber ku bi eslê xwe Kurd in, ew dibin hedefa rexneyên giran. Ger mirov lîsteya kesên ku bi eslên xwe Kurd in û bi Tirkî, Erebî û Farisî distirin û dinivîsin li vir bide, wê lîsteyeke dirêj jê derkeve, lê emê tenê qîma xwe bi vê kurtemînaka li jor bînin.

Gotineke mamoste İsmail Beşikçi heye, dibêje: **"Tu bi çi zimanî binivîsî tu yê mîna însanê wî miletî jî bifikirî."**

Îcar gava ku em li rêxistin û partiyên xwe yên Kurdan dinihêrin, em dibînin ku navên wan û navên hemû kovar û rojnameyên wan bi Kurdî ne. Pir baş e; lê piraniya civîn, semîner û rûpelên kovar û rojnameyên wan bi Tirkî, Erebî û Farisî ne.

Bi Kurdî nivîsandin, bi Kurdî axaftin wezîfeya her hêz, komele, kovar û rojnameyên Kurdan e. Lewma divê em rojekê berî rojekê li Kurdî vegerin, civîn, semîner, kovar û rojnameyên xwe bikin bi Kurdî.

Ji ber ku çapemeniya dewletên ku Kurdistan dagîr kirine, bi hemû hêz û îmkanên xwe ve me asîmîle dikin, dixwazin zimanê me bidin jibîrkirin, da em nikaribin bi zimanê xwe bipeyivin, bi zimanê xwe binivîsin û em mîna Kurdekî nefikirin. Bi kurtî ew dixwazin em bi her awayî ji xwe û ji nasnameya xwe bi dûr bikevin, di nava miletên serdest de bihelin û winda bibin.

Pêşî li vê yeka hanê girtin kar û berpirsiyarên hemû rêxistin, partî, sazgehên demokratîk, enstîtu, akademî û rewşenbîrên Kurdan e.

Ji ber ku meseleya zimanê Kurdî meseleyeke siyasî ye. Ji ber vê yekê jî, divê her Kurd, careke din li ser girîngî û muhîmbûna zimanê Kurdî bifikirin.

Gava em bi zimanên serdestan dinivîsin gelo em berê xwe didin kê? An jî divê em berî her tiştî berê xwe bidin kê? Bêguman divê em berê xwe bidin gelê xwe yê Kurd.

Di eslê xwe de ev dewletên ku Kurdistan di nava xwe de parve kirine, bêaqil in. Ji berdêla ku wan Kurdî li me qedexe kirine, diviyabû wan zimanê xwe li me qedexe bikirana. Wê çaxê wê gelek kovar, rojname, rêxistin û partiyên me jî, ji holê rabûna.

Îcar ronakbîr... şoreşgerên.... Kurd.

Ger hin dengbêj û nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in, bi zimanê dewletên ku Kurdistan di nav xwe de parçe kirine, distrên û dinivîsin, em hezar rexneyan li wan digirin, hûn jî ne kêmî haziran in, hûn dibin alîkar ku em bi zimanê dijmin binivîsin û em wek Kurd jî nefikirin.

Ji kerema xwe re, mîna pêşiyên me gotine: **"Kumê xwe deynin ber xwe û hinekî bifikirin"**

Ger em bixwazin em Kurdistanî bin, divê em berî her tiştî bi Kurdî bifikirin û bi Kurdî binivîsin.

**ŞIRÎKO**

# Cih û warê ajalên bi xetere

*Burjûwazî her çiqas navê stûna demokrasiyê li meclîsa xwe dikir jî, dîmena meclîsê ji derve wisa nedixuya, zêdetir dişibiya tiştekî din. Marx jî gotibû: "Cihê ajalên bixetere." Tê gotin ku meclîsa herî demokratîk piştî Meclîsa Ruhspiyan ya di dema komunê kevnare de, meclîsa Sovyetîk bû, ev jî bi serweriya burokrasiyê ji holê rabû, dîsa li gorî çavdêriyên hinek mirovan "Koma Gela" ku li Kurdistanê di nav gel de ava bûye, bi şêweyekî pir demokratîk kar dimeşîne û pirsgirêkan çareser dike.*

Parlemento, li welatê ku lê demokrasî heye, wek stûna demokrasiyê tê binavkirin. Dîroka parlementoyê heta Yewnanîstana kevin diçe. Wê demê Meclîsên komarên bajarî yên Grekî, bi demokrasiya raste rast, ya bênûner xebitîne. Li Romayê du meclîs hebûne, yek ya "hemwelatiyan" ya din jî ya "arîstokratan," wek tê zanîn bingeha Împaratoriya Romayê li ser têkiliyên koletiyê ava bûbû, ji ber vê yekê mafê koleyan tunebû ku bikevin van meclîsan.

Dema feodaliyê meclîsa feodalan (axayan) hebû ye, di vê demê de jî tu mafên mirovên ku li ser erdê dixebitin, ango serfan (xulaman) tunebû ye. Rista meclîsê zêdetir piştî kapîtalîzmê derket holê, burjûwazî di gel desthilatiya xwe, meclîsa xwe jî ava kir. Dema hîn ku burjûwazî li dijî arîstokrasiyê di şer de bû û şerê xwe bi piştgiriya çînên kedkar dimeşand, di meclîsa xwe de cih di da van cînên kedkar jî, lê dema dît ku ew tişt bi xetere ye û bi hêzên arîstokrat re li dijî karkeran hevkarî pêk anî, dev ji vê yekê berda. Burjûwazî her çiqas navê stûna demokrasiyê li meclîsa xwe dikir jî, dîmena meclîsê ji derve wisa nedixuya, zêdetir dişibiya tiştekî din. Marx jî gotibû: "Cihê ajalên bixetere." Tê gotin ku meclîsa herî demokratîk piştî Meclîsa Ruhspiyan ya (di dema komunê kevnare de), meclîsa Sovyetîk bû, ev jî bi serweriya burokrasiyê ji holê rabû, dîsa li gorî çavdêriyên hinek mirovan "Koma Gela" ku li Kurdistanê di nav gel de ava bûye, bi şêweyekî pir demokratîk kar dimeşîne û pirsgirêkan çareser dike. Heta gundiyekî ji Kurdistanê nû hatî wiha digot:: "Heke êrîşên dijmin tune bin em di nav bihuştê de ne." Em niha vegerin ser "Warê ajalên bi xetere." Marks ev nav li Meclîsa burjûwazî ku bi destê burjûwaziyê şoreşger hatibû avakirin dikir. Lê wek me berê jî got, piştî ku şoreşgerî ji bo burjûwazî bû asteng û wî bi feodalan re hevkarî ava kir, êdî bi giştî bêbingehiya meclîsê derket holê. Li welatên kapîtalîst, ên herî demokratîk jî tê de, niha meclîsê deriyê xwe jî nûnerên çînên kedkar re girtiye û demokrasî jî şeklî ye.

Li welatên ku tu şer di navbera hêzên feodal û burjûwa yan de çênebûye, têkiliyên kapîtalîst bi riya dewletên din cih girtine, wek hemû saziyên ku ji demokrasiya burjûwazî re bibin bingeh, meclîs jî şeklî ye. Ji bo çînên kedkar bi rêxistin bûn qedexeye. Derbeyên leşkerî bûyerên şev û rojekê ne. Li van welatan axayên berê timtêlên burjûwazî li xwe kirine, kapîtalîzma yekdestî (monopolîst) rê nedaye ku saziyên demokratîk rihên xwe berdin nav kûrahiya erdê. Çawa ku bayekî xurt lê dide ji erdê re yeksan dibin. Li van dewletan têne navê demokrasiyê heye, ew jî ji bo xapandina gel. Ji lewra ev tişt paşverûtiya çînên serdest xurt dike. Îca li welatên wek Tirkiyeyê, ku hem kole û hem jî koledar in rewşa çîn û gelê bindest hîn dijwar e. Mêtîngehkariya paşverûtiya wan du qat dike. Li Romaya koledar ku, kole xwediyê çi mafî bin, li ew dewletên ku Kurdistan dagirkirîne bi taybetî li Tirkiyeyê jî Kurd xwediyê wî mafî ne.

Li ba rayedarên van dewletan ji bo Kurdan navê demokrasiyê jî derbas nabe. Ji lew re meclîsa Tirkan gotina Marx ji sedî sed rast derdixe û jê xeynî dengê dijmîn û tîzikan dengê tiştekî nayê.

**Samî BERBANG**



I. Cem Özkan

## XAÇEPIRS

**Amadekar: Rasto Zîlanî**



**Çeperast:** 1–Keça Kurd a ku di Newroza 94'an de xwe li Almanyayê şewitand. Di wêneyê de tê dîtin 2–Gotina pejirandinê/ Bihêrs 3–Kesê rûreşiyê dike/ Çiyayê herî bilind ê Kurdistanê 4–Nîvkêfxweşiyê îfade dike/ Dijwateyê tavê/ Ji niha pê ve, ji hingê pê ve 5–Ji pîvazên nêr re tê gotin/ Şaxekî zanistê 6–Beyanname 7–Navê devereke tûrîstîk ku li ser bajarê Nevşehirê ye û bi çêkirina ceran tê navdar e 8–Navê bajarekî Erebîstanê ku li wê derê Hz. Muhemed wefat kiriye 9–Yezdanê Rojê/ Tiştê ku aîdê mirov e 10–Dîtin/ Mirov saya wî birêve diçe

**Serejêr:** 1–Namzet 2–Navê navçeya Dihê yê bi Tirkî/ Kes an jî tiştê ji rê derketî 3–Mala ku file lê îbadetê dikin/ Dadan, girtin (Berepaş) 4–Gotineke ku di nav axaftinê de di wateya "Efendim, ezxulam" de tê bikaranîn 5–Madeya ku di nav atmosferê de wek tewekê (tebeqeyekê) ye û li gorî zanyaran, li ber qulbunê ye 6–An, an jî/ Beşeke Quranê 7–Bingeh, temel/ Mam, birayê bavê mirov 8–Şîrove, daxuyanî/ Paşnavê resamê surrealîstê Spanyol ku pêşnavê wî Salvador e û bi helwestên xwe yên averêtiyê navdar bû 9–Qaput, çaketê sitûr ku zivistanê tê lixwekirin 10–Debûş, celebekî zemqê 11–Alelade, tişt an jî kesê ketûber 12–Goreya di şiklê solê de di nav malê de mirov dixe piyê xwe.

**BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ**

**Çeperast:** 1–Paul Eluard 2–Al/ Îm/ Stû/ Ez 3–Rîsk/ Dû/ Nevî 4–Aks/ Orly/ Nîd 5–Sa/ Al/ Evînî 6–Trajedîk 7–Zayînî 8–An 9–Ad/ Here 10–Epîk/ Nû

**Serejêr:** 1–Parastin 2–Alîkar/ Ap 3–SS/ Azadî 4–Lîk/ Ajan 5–Em/ Oley 6–Dr/ Dîmen 7–Usûl/ În/ Rû 8–At/ Yekîne 9–Rûn 10–Enî 11–Evîn 12–Êzîdî


## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ...... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiyê razînin:**

**Li derve:** Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

**Li Tirkiyê:** Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

**Navnîşana Welat:** Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul


Tel (Fax) 511 50 07

**Mercên abonetiyê:**

| | Li hundir | Li derve |
|---|---|---|
| 3 meh | 175.000 | 30 DM |
| 6 meh | 350.000 | 60 DM |
| 12 meh | 700.000 | 120 DM |

Çîrok bo mindalan (Soranî)

# Serbestî rasteqîn e



Masîgireke hemû rojê beyanî zû, be xoy û torekeyewe deçûwe kenarî rûbareke û destî be rawe masî dekird. Rojêkiyan masiyekî biçkolaney zor zîrek le gel toreke da kewte giftûgo û pêy wit:

– Baş e to bo çî dilî em hemû masiye deşkênî û xot bo em rawçiye tawanbar dekeyt?

Toreke witî:

**– Taze min tûş bûm û natiwanim xom lem hale rizgar bikem.**

– To rast nakeyt, eger be qisey nekeyt qabîle çît lê dekat.

**– Min natiwanim be qisey nekem, belam le mew duwa be bê ewey ew agadar bê hergîz to nagrim.**

Masî û toreke bem şêweye maweyekiyan be ser bird... Toreke masiyekey hel nedelûşî, belam hemû rojê jimareyekî tazey le hawrêkanî rapêç dekird bo rawçiyeke, ta rojêkiyan masiyekey zor be xembarî bînî, lêy pirsî:

**– Hawrêm ewe bo çî xembar î?**

Masiyeke be xembariyewe witî:

– Bîr lew hawrêyanem dekemewe ke be destî to malawayan le jiyan kird.

**– Ca to serbest î, îtir bo xefet dexoy?**

Masiyeke henaseyekî helkêşa û witî:

– Axir em serbestiye çawbest e, serbestî rasteqîne lewedaye ke rojêk bêt rawçî û tor le ser rûy zewî da nebînrên.

**PISMAM**

# Em hevaletan nawî Diyarbekir e

**(SORANÎ)**

Mindale xoşewîstekan im... Em katetan şad. Kake Diyar be resen xelkî gûndî Qelaçoxey nawçey Çemçemale le başûrî Kurdistan le Newrozî 1992 da le dayîk bûwe. Diyar wekû hemû mindalanî tirî Kurdistan, mindalêkî çawgeş û rohsûk û xwênşîrîn e. Dayîk û bawikî Diyar (Şehla û Bekir) le xoşewîstî Diyarbekir î paytextî Kurdistanî mezin nawî kûrekeyan nawe Diyar û em wêneyey Diyar yan be diyarî bo mindalanî bakurî Kurdistan nardûwe, ta le başûrî Kurdistan ewe evînî xoyan bo paytextî Kurdistan derbibrin.

Hozanî şorişgêrî gelî Kurdman Lalo Rencder zor ciwan der barey Kurdistanî mezin de diwê û delê:

*Kurdistanekem, min ke hejar im*
*Pirsiyarî nawê xelkî kam şar im*
*Le Diyarbekir bim, yan le Kirmaşan*
*Xelkî Kerkûk bim, yan şarî Bokan*
*Yan le Mihabad, Çiwar Çiray Qazî*
*Yan le Koye bim, şarekey Hacî*
*Yan le Qamîşlî şarî Cigerxwîn*
*Yan le Hewlêrî Holako bezên*
*Min her roley tom, le to be der nîm*
*Çewsaweyekim lêt bê berî nîm..*
*Mindale azîzekanim...*


Êsta Diyar le Kurdistanî azad dejî. Belam rewşî abûrî gelekemanî rûberûy tengasiyekî wa kirdotewe ke Diyar û zorbey mindale azîzekan man le Başûr netiwanin be arezûy dilî xoyan bijîn.

Hawrê xoşewîstekanim... Be hîway ew rojey ke êwe, Diyar û hemû mindale çawgeşekanî Kurdistan azad û serfiraz bin û gund û çiyatan nesûtê û le qutabxane û baxçe û seyranga û yarî bê beş nebin.

Le diwayî da dexwazim em helbestey mamosta Abdullah Peşêw îş bixwênewe, xoşîtanim gerek e û her bijîn.

*Minalekan*
*Dezgîranim*
*Kotirêkî Diyarbekir e*
*Hezî le çiya û qaspey kew û,*
*Rengî befr e...*
*Bo giwastinewey*
*Zincîrey çiyam qef qef birî*
*Rojimêrim per per dirî*
*Paseportim*
*Awat û zerdexene bû*
*Kildan û Kisêk xeme bû*
*Ke le dergay sinûrim da*
*Le ciyatî maç,*
*Maçî germî dezgîranim*
*Tifî zerdî postal reşê*
*hat swaxî da nawçewanim.*

**PISMAM**



# Li San Diegoyê civata Kurdî

## Endamê Kongreya Kurdî ya Navneteweyî û Berpirsiyarê Şûbeya li San Diegoyê Seyf Bedirxan: 'Divê Kurd jî berjewendiyên xwe ji bîr nekin'

**Ev hevpeyvîn ji aliyê Kurdolog û nûçevanê Welat yê Amerîkî Selmanî ve bi Kurdekî navdar Seyf Bedirxan re hatiye çêkirin û rewşa Kurdên ku li San Diego dijîn ji me re diyar dike.**

*Ji kerema xwe bi kurtî hûn xwe nadin naskirin?*

– Belê. Navê min Seyf Bedirxan e. Bav û bapîrên min ji Cizîra Bohtan bûn. Piştî hingê me bar kir, em çûne Sûriyeyê, Urdunê hwd.

*Çend salên we ne, ku hûn li San Diegoyê dijîn?"*

– Şanzdeh sal in ku ez li vir im.

*Li Dallasê, Teksasê civakeke Kurdî ya pir mezin heye. Zorbeya wan jî xelqên Kurdistana Iraqê ne. Li Nashville, Tennessesê jî civakek heye, bi saya paneberên ji nû hatî ew jî mezin bûye. Li bajarên din jî hene.*



*Zarokên Kurd li San Diego govend digirin*

*Hûn li Sûriyeyê mezin bûn, ne wisa?*

– Erê, ji sala 1946'an heta sal 1980'an em li Sûriyeyê bûn, piştî hingê em heşt salan li Urdunê man. Ji 1968'an heta 1976'an em li Lubnanê bûn. Ji 1976'an û pê ve ez li Amerîkayê me.

*Ji kerema xwe re, hinekî qala civaka Kurdî ya li San Diego bikin. Kurda çima San Diego hilbijart? Çend sal in, ku li vir in?*

– Em dikarin civaka Kurdî ya li San Diegoyê bi sê babetan par bikin:

1– Yên ku hatine piştî sala 1975'an Amerîkayê. Gava ku şoreşa Kurdî tê de ma, hikûmeta Amerîkayê nêzîkî 2500 Kurd hewandin.

2– Ên ku di navbera 1978'an û 1990'an de bi xwe û xwe hatine Amerîkayê, ne ji ber şoreşê (şoreşa Kurdistana Iraqê).

3– Penaberên Kurd ku ji sal û nîvekê ve hatin. Piştî 1991'î de hikûmeta Amerîkayê dîsa vîze dane 3500 Kurdan, Kurd ji Kurdistana Iraqê hatin.

*Peywira we li hemberî wan çi ye?*

– Ez endamekî Kongreya Kurdî ya Neteweyî (KNC–Kurdish National Congress) me û Berpirsiyarê Şûbeya San Diegoyê me. Ji 1991'î û pê ve, çalakiyên me ev in:

1– Em hewl didin ku em civaka Kurdî bibin yek.

2– Em bi xelqê Amerîkayê rewşa Kurdî didine naskirin.

3– Em lavahiya hikûmeta Amerîkayê dikin, ku berjewendiyên Kurdan ji bîr ve nekin. Armanca me damezrandina Kurdistaneke azad û yekbûyî ye, li hemû beşên Kurdistanê yên Tirkiyeyê, Sûriyeyê, Iraqê û Iranê. Sala 1991'î KNC'ê rabû, pere, cilik (kinc), dermanên tibbî civandin û şandine Kurdistanê. Civaka Kurdan ya San Diegoyê bi gelek xwepêşdanan ve (muzahere) xwe nîşan dan. Li nav San Diegoyê de gelek caran em xwe pêş didin, ji bo gelê xwe û ji bo Kurdistanê. Peywireke me ya din jî heye; alîkariya penaberên nû ye. Di Tebaxa 1991'î de penaberan dest bi hatinê kir û heta niha gihiştine nêzîkî 220–230 penaberî. Di nav du salên wê bên de çavnêriya min ev e, ku navbera sed û du sed kesê din wê bên. Ji wan Kurdan ne hemû yekser ji dewletên biyanî tên; çend kes ji welatên din li nav Amerîkayê wê bêne vir. Bo nimûne, me niha pêncî Kurd û zêde ji Fargo, Nerth Dakota anîne vir. Dema tê bihîstin ku li San Diegoyê civakeke Kurdî ya mezin heye, Kurd ji her çar goşeyên Amerîkayê jî dixwazin bên û li vir rûnin!"

*Civaka Kurdî ya San Diegoyê ji çend kesan pek tê? Ji çend malan?*

– Bi rastî nayê zanîn; îstatîstîk (hiljimar) di destê me de tune. Bo nimûne, Kurdên Îranê li vir pir in, lê belê em ji wan bi tenê çend kesan nas dikin. Ez dibêjim, li San Diegoyê di navbera 1000 û 1200 Kurd hene. Ji çend malan pêk tên? Ev jî bi dijwarî tê zanîn. Mal hene, ji du–sê kesan çêdibin û yên din jî hene, ji çardeh, hevdeh kesan çêdibin. Bi texmîna min, kêm û zêde 250 mal hene.

*Kurdan çima San Diego bijart? Tê de tiştekî taybetî heye?*

– Ji destpêkê, kêfa wan ji hewaya San Diegoyê re dihat, ez dibêjim. Cihekê xweş e, tê de cirm û tawan kêm in, li gora bajarên din ên Amerîkayê. Paşê ji ber ku bihîstin li vir civakeke Kurdî heye hatin, wek min gotiye.

*Hûn çi çalakiyên çandî li vir bi rê dixin?*

– Çalakiyên me bi sê babetan têne parkirin.

1– Çalakiyên di gel grûbên navneteweyî û Amerîkayî, da ku em rewşa Kurdan û çanda Kurdî bidine naskirin û gava ku em xwepêşdanekê pêk tînin rojnamevanan vedixwînin

2– Car carina em staranbêjên Kurd yên bi nav û deng vedixwînin, wek Şivan, Rezazî, yan Ciwan Haco, ku bên û konserekê li vir pêk bînin. Hefte û seyranên Kurdî jî bi govendan her sal çend car çêdibin, ji bo Newrozê hwd.

3– Axaftinên (civankên) der heqê çanda Kurdî, dîroka Kurdî, wêjeya Kurdî de, yan gava ku kesekî mezin wefat dike, em bo bîranîna wî livbaziyeke taybetî pêk tînin. Hefle dawetên Kurdî pir in nemaze di vê demsalê (havînê) de."

*Min bihîstiye, ku li San Fransiskoyê, hemû dikanên beqalî di destên Ereban de ne. Li wê, em karin bêjin ku beqaltî bûye pîşeyeke Erebî. Li vir, pîşeyeke Kurdî ya taybetî heye an na?*

– Ez dibêjim, ajotkariya texsiyan pîşeyeke Kurdî ye. Xwediyên dikanên beqalî yên Kurd jî hene, makînevan (mekenîk) jî hene. Yên ku li zanîngehê dixwînin jî kêm nîn in.

*Ji Rojhilata Navîn kîjan miletên din jî hene li San Diego?*

– Ez benî, Ereb hene, Ermenî hene, Keldanî û Asûrî jî hene. Tirk gelek kêm in. Ez dibêjim hindik maye nayên hesibandin li vir. Civaka Îranî jî gelek fireh e ji hemûyan bêtir in."

*Ew Erebên hûn dibêjin ji kîjan dewletan hatine?*

– Yên Iraqê jî hene, Filistînî jî hene, çend Urdunî, Sûriyeyî, Lubnanî jî hene. Piraniya wan wek xwendekar hatine vir, an jî wek koçer (göçmen). Bi kurtî, ew ji bo sedemên aborî hatine vir, ne wek Kurdan, ku ji bo sedemên siyasî bêçare bûn û wek penaber hatine vir.

*Peywendî yên navbera Kurdan û van miletên din yên Asûrî, Keldanî, Ereb, Îranî û Ermenî çawan in?*

– Di gel dijberiya Iraqê peywendî heye. Di gel Ermeniyan jî hin peywendî hene. Têkilî bi Asûriyan û Keldaniyan gelek fireh in. Ji wan pir kes jî hene ku bi Kurdî baş dizanin.

*Kek Seyf, ji xeynî San Diego, civakên Kurdî li Amerîkayê li hin deverên din jî hene?*

– Li Dallasê, Teksasê civakeke Kurdî ya pir mezin heye. Zorbeya wan jî xelqên Kurdistana Iraqê ne. Li Nashville, Tennessesê jî civakek heye, bi saya paneberên nû hatî ew jî mezin bûye. Li bajarên din jî hene. Wek Kalîforniyayê, wek Los Angeles û San Fransîskoyê. Li Los Angelesê, ez dibêjim, pênsed Kurd hene. Kurdên Îranê pir in li wê, ji ber ku li San Fransîskoyê jî civakeke biçûk heye. Du kes an kêmtir. Li Norh Dakorayê, penaberên nû hene. Li Detroît, Michigan, Ohio, li Washingtonê, D.C û li New Yorkê hin Kurd hene, ji bîr ve neke ku li Kanadayê jî dormedora 3000 Kurd dijîn.

*Li Amerîkayê, çend Kurdên Tirkiyeyê hene, bi texmîna we?*

– Ji ber ku gelek kêm bi livbaziyên me beşdar dibin, ji min wisa tê sed heta sed û pêncî kesî, ne zêde. Li hemû San Diegoyê, ez bi tenê du Kurdên Tirkiyeyê nas dikim.

*Wê gavê, gelo em jî karin bêjin ku piraniya Kurdên îro li Amerîkayê dijîn ji Kurdistana Iraqê hatine?*

– Erê, lê belê KNC xwe wek rêxistineke neteweyî ji bo hemû Kurdan dide naskirin. Armanca me, wek min gotiye, damezirandina Kurdistaneke azad û yekbûyî ye. Ji ber vê yekê, em Kurdan ji hemû beşên Kurdisatanê wek hev dibînin. Bo me tu cudayetî nîn e, ew hemû endamên yek gel, yek neteweyî ne.

*Erê, Kek Seyf, gotina we ya dûmahîkê çi ye?*

– Ez hez dikim ku hemû serok û rêvebir û rêxistinên Kurdî yek bin. Bêyekîtî, armanca me ya neteweyî tu car çênabe. Ji yekîtî û pê ve, divê ku serokatiya Kurdî, li her çar beşên Kurdistanê jînê hîn bibe (fêr bibe), bi civaka navneteweyî re ragihînê (communicate), nemaze bi Amerîkayê û dewletên Ewrûpa re. Êdî wext bû ku em enînivîsa xwe bigirine destên xwe. Wêbêya me bi siyaseta navneteweyî ve girêdayî ye. Divê ku em hîn bin, ji bo berjewendiya xwe (kêra xwe) bileyîzin, ku em jê bibin û ne ku ew ji me bibe.

*Bi navê hemû xwendevanên rojnameya Welat ez gelek spasdar im ji vê hevpeyvînê!*

– Li ser çavan, hûn di xweşiyê de bimînin.

**Hevpeyvîn: SELMANÎ**

welat

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel (fax) 511 50 07
- Nûnerên Rojhilata Navîn (Ortadoğu Temsilcileri) Fener Rojbiyanî – Jan Dost
- Nûneriya Ewrûpa (Avrupa Temsilciliği) Amed Tigrîs
- Navnîşan (Adres) Drakenbergsg. 63, NB. 117 41 Stockholm / Sweden • Tel (0046) 884 01 25 • Fax (0046) 884 96 35
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık